

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat


Hejmar: 10

Sal: 1

Tîrmeh 1993

Biha: 15.000 TL

Yê ku azadiyê  
nede dîgeran,  
ne layiqê azadiyê ye!



# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	EREÎ	MÎNAK
A a	Av	ا ، ئا	ئاڤ
B b	Bersîv	ب	بەرسێڤ
C c	Can	ج	جان
Ç ç	Çar	چ	چار
D d	Dengbêj	د	دەنگبێژ
E e	Evîndar	ه ، هه	هه‌ڤێندار
Ê ê	Êdî	ئێ ، یێ	ئێدێ
F f	Ferman	ف	فەرمان
G g	Garis	گ	گارس
H h	Hejîr	هه	هه‌جێر
I i	Igal	-	ئێگال
Î î	Îsot	ئێ ، یێ	ئێسۆت
J j	Jîndar	ژ	ژێندار
K k	Keleh	ک	که‌له
L l	Lawik	ل	لاوک
M m	Mehîn	م	مه‌هین
N n	Nex	ن	نه‌خ
O o	Ordî	ئو ، و	ئوردێ
P p	Perwer	پ	په‌روه‌ر
Q q	Qehreman	ق	قه‌هره‌مان
R r	Rîzgarî	ر	رزگاری
S s	Selam	س	سه‌لام
Ş ş	Şêr	ش	شیر
T t	Têkoşîn	ت	تێکوشین
U u	Unsîr	ئو ، و	ئونسیر
Û û	Ûşî	ئوو ، ووو	ئووشی
V v	Vekirin	ڤ	ڤه‌کرن
W w	Wekhevî	و	وه‌که‌هڤی
X x	Xwestin	خ	خه‌سته‌ن
Y y	Yekîfî	ی	یه‌کتی
Z z	Zêr	ز	زێر

Xwedî

(Sahibi)

MAHMUT YARLUĞ

Berpirsiyarê Giştî

(Genel Yayın Yönetmeni)

SABAH KARA

Berpirsiyarê Nivîsaran

(Sorumlu Yazışleri Müdürü)

SÜLEYMAN ÇEVİK

Mudîrê Tîprêzî û Arşivê

(Dizgi ve Arşiv Müdürü)

ALİ KARADENİZ

Muşawirê Nivîsaran

(Yayın Danışmanı)

MUSTAFA GOYANI

Nûbihar kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda Kurdî bi mana tevayî dilebîke. Raman û rayên xwedîyên karpêkan, lîzûmen ne raman û rayên Nûbihar in. Nivîsarên ku bi înzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê Nûbihar tên weşandin raman û raya me nîşan didin. Nûbihar di ser-rastkirina karpêkên şandî de azad e.

BEDELA ABONETIYA SALINÎ:

Li hundir: 180.000 TL

Li derve: 60 DM

JIMAREYÊN HESABÊ:

Li hundir: Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

NAVNÎŞAN (Adres):

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3

Fatih - İstanbul

TEL: 533 75 88

FAKS: 524 00 38

TÎPRÊZÎ (Dizgi):

Nûbihar

BERG (Kapak):

Dönüş

ÇAPXANE (Matbaa):

Mutlu Ofset

## NAVEROK

<b>NÛBIHAR: GEREKE KURD NÎŞAN BIDIN KU LAYIQÊ AXAFTIN Û XWENDIN Û NIVÎSÎNA BI ZIMANÊ XWE NE!</b> .....	3
<b>SABAH KARA: YÊ KU AZADIYÊ NEDE DÎGERAN, NE LAYIQÊ AZADIYÊ YE!</b> .....	4
<b>SÜLEYMAN ÇEVİK: AZADÎ HEQÊ HERKESÎ YE</b> .....	6
<b>ALİ KARADENİZ: AZADÎ Û EZPERISTÎ HERDU LI CÎKÎ NABIN</b> .....	8
<b>MELE ZAHID HEZROWÎ: FEXRA EHLI ÎMAN, SE'ÎD</b> .....	9
<b>BEDÛZEMAN SEÎD Ê NORSÎ: MEQAMA DUYEM A PEYIVA SÊZDEM</b> .....	10
<b>RAÎFÊ BÊÇARE: EZ Ê BÊBEXT</b> .....	12
<b>SABAH KARA: NAMEYÊN BÊCEWAB / 10</b> .....	13
<b>SEÎD GUNDÎ: ÎSLAMIYET</b> .....	14
<b>M. RAÛF ÇİÇEK: RÊXISTINA BELAVKIRINA AMOJKARÎ Û WEŞANÊN KURDÎ</b> .....	16
<b>M. HEQQÎ RIŞWANÎ: ÊDÎ JI XEW RABIN, RAZAN BES E!</b> .....	17
<b>HISEYN ELÎ BAŞAR: FIKIR</b> .....	18
<b>ZEYNELABIDÎN ZINAR: MELE EHMED Ê CIZÎRÎ</b> .....	19
<b>XELÎL AMEDÎ: PÊKENIYEK JI XOCÊ MEŞHÛR</b> .....	22
<b>M. ELÎ ULU: PÊŞVEÇÛN, BI XWENDIN Û DESTHEVGIRTIN Û XWE BI ÎSLAMÊ VE GIRÊDANÊ YE</b> .....	24
<b>FÎKRÎ BOZKURT: ÎSLAM Û MESELA QEWMIYETÊ</b> .....	25
<b>MELA QASIM: NUQURÇ / 3</b> .....	26
<b>NAMEYÊN WE</b> .....	27
<b>FERHENGOK</b> .....	31
<b>ALİ KEÇELÎ: RÊZEPİRS</b> .....	32

KARİKATUR



# GEREKE KURD NÎŞAN BIDIN KU LAYIQÊ AXAFTIN Û XWENDIN Û NIVÎSÎNA BI ZIMANÊ XWE NE!

Adeteke me yî pir xirab heye: Dema musîbetek tête serê me, em derhal webala wê musîbetê bi tevayî davêjin gerdena dijmin. Em dilê

min, gelek tiştan kiriye. Bûye maniê gelek tiştan. Nehîştiye em gelek tiştan bikin.

Lê gelo me bi xwe çi kiriye?

Me tiştê ku ji destê me têt, kiriye; an me xewa tarî tercîh kiriye?

Ev hal, meselokeke pir calib î Xoceyê Meşhûr, yanê Xoce Nesredîn tîne bîra me:

Şevêkê diz dikeve mala Xoce Nesredîn û tiştêkî li mala wî nahêle, her tiştî dibe.

Bi roj, dema ku Xoceyê Meşhûr qala vê diziyê ji hevalê xwe re dike, hemû, her kes ji aliyekî Xoceyê Meşhûr sûcdar dikin.

Yek dibêje: “Ma te çima deriyê xwe qenc kilît nekir?”

Yê din dibêje: “Ma te çima mal û warê xwe neveşart?”

Yê din dibêje: “Ma tu çima razayî? Dema ku tu raketî, gereke jina te hişyar bane û dema

ku jina te raket, gereke tu hişyar bimayî.” û hwd.

Wextê ku Xoce Nesredîn van gotinan dibêse, bi heyret û teacub li wan divegerîne ku:

“Ma gelo ti qebaheta diz tineye?”

...

Ma gelo li ber vî halê ku em têde ne, ti qebaheta me tineye?

Ma me wezîfa xwe qenc pêk aniye?

Vaye şikir ji Xweda re, kovar û kitêbên me diweşin. Lêbelê ma em bi heddê kafî van kovar û kitêban dixwînin? Ma em van kovar û kitêban didine xwendin?

Erê. Gereke kurd nîşan bidin ku layiqê axaftin û xwendin û nivîsîna bi zimanê xwe ne.

Heger na, wî wextî hengava ku me nikarî em kovar û kitêban biweşînin, bila kes lewma li me neke.

...

Xwendevanê hêja!

Ko bi zehmet û kotek be jî, vaye Nûbihar diweşe.

Li Nûbihar a xwe xwedî derkeve.

Li zimanê xwe xwedî derkeve.

Nîşan bide ku tu layiqê jiyanê çêtir î.

Heger na, naxwe ti heqê te tineye ku tu ji vî halî şikayetê bikî! □



Berga hejmarê me ya nehan

xwe rahat dikin û dibêjin: “Dijmin kir! Dijmin bû maniê me! Dijmin nehîst em tiştêkî bikin!”

Erê. Rast e ku dij-

# YÊ KU AZADIYÊ NEDE DÎGERAN, NE LAYIQÊ AZADIYÊ YE!

•  
**Îro di vê civaka em têde dijin de mirov liqayî hinan têt ku evana ji xwe re azadiyê dixwazin, lêbelê ew bi xwe ne hazir in azadiyê bidin mirovên din. Hetta dev ji azadiyê jî biqere, evana ne hazir in heqê jiyînê jî bidin terefê miqabil.**

Îro di vê civaka em têde dijin de mirov liqayî hinan têt ku evana ji xwe re azadiyê dixwazin, lêbelê ew bi xwe ne hazir in azadiyê bidin mirovên din. Hetta dev ji azadiyê jî biqere, evana ne hazir in heqê jiyînê jî bidin terefê miqabil.

Di vê civakê de hengava tu devê xwe divekî ku tiştêkî bibêjî, te dît ku derhal ji te pirsîn:

“Tu ji kîja grûbê yî?”

“Tu endamê kîja partiyê yî?”

“Tu terefdarê kîja komeleyê yî” û hwd.

Bi ser de jî, li benda bersîvandina te jî namînin evana. Ew bi xwe bi dewsa te bersîv didin pirsîyarên xwe. Hukim li te dibirrin. Te li cihekî dirûnînin û bi tîrên jehrdar î xwe, êrîşî te dikin.

Ma wê çima guh bidin bersîvên te? Ma ti îhtiyaca wan bi bersîvên te heye?

Bi baweriya wan: Helbet na! Lewra heqîqet di berîka wan de ye!

Naxwe dema ku ewana hebin, ti kes nikare dawê heqdarîyê bike!

Gelo çî kes in ev?

Tu ji wan bipirsî:

“Rîstem ê Zal” in!


“Mehdî” ne!

matîzm û dogimtî, bi tenê di ol û oldaran de têtê dîtin.

Ev tesbît, weke gelek tesbîten umûmî, tesbîteke xelet e.

Dema ku meriv tesbîtek danî ortê û tarîfekê kir, gereke ew tesbît û tarîf, bêyî îstîsna bin, da ku em bikaribin wan qebûl bikin.

Xusûsen di redkirina tiştêkî de ev qaîde hê jî zarûrî ye. Lewra di îsbatê de dema ku te got,



“Mesîh” in!


Lêbelê tu rastiyê bixwazî, diyar e ku evana çî kes in:

Dogmatîk in!

Dogim in!

Hinin dibêjin dog-

meselen “Sêv heye.”, hengava ku tu sêvekê bi tenê jî nîşan bidî, tu karî vê îdîaya xwe îsbat bikî. Lêbelê dema ku te got, “Sêv tineye.”, gereke tu li hemû aliyên



destê van dogiman kişandiyê.

Derdê dinyayê, berî ku derdê parvebûn û ji hev cudabûna teşkîlat û ramanan be, derdê dogmatîkiyê ye. Lewra dinya ji çi kişandibe, ew tişt, eserê dogiman e.

Meriv bi hêsanî kare dogiman binase; bi şertê ku ew bi xwe ne dogim be!

Hemû şexsên dogim, nezan in.

Lêbelê her nezan, ne dogim e. Nezanê dogim ew nezan e ku, nizane ku nezan e û xwe zana qebûl dike; loma li zanîne nagere.

Naxwe gereke dijminê me, ne raman û teşkîlat bin. Gereke dijminê me, mirovên dogim bin.

Ew mirovana bi xwe ti azadiyê bi kesî nadin, naxwe ewana ne layiqê azadiyê ne.

Lewra dema ku tu azadiyê bidî wan, weke ku tu gurê har ji zencîr berdî.

Dema ku tu azadiyê bidî wan, ew ê pêşî azadiyê qir bikin.

Naxwe, mirovên dogim, ne layiqê azadiyê ne. □

dinyayê bigerî û nîşan bidî ku sêv ne mewcûd e.

Vaye em dibînin ku di nav oldaran de yên ku ne dogim û dogmatîk in, hene. Naxwe ev îdîaya ku dogmatîkbûnê ayidî oldaran bi tenê dike, ne rast e.

Mirovên dogim, di nav hemû teşkîlat û dînan de tene dîtin. Her wisa, yên ku ne dogim in jî di nav hemû teşkîlat û dînan de hene.

Naxwe dogim û dogmatîk çi kes in?

Bi baweriya min, dogmatîzm di nav nezanan de, xusûsen jî di nav nezanên ku nizanin nezan in de tene dîtin.

Ev nezanên ku nizanin ku nezan in, di nav

hemû teşkîlat û dînan de hene.

Evana ji ber ku nezan in, qîmeta zanîne qet nizanin. Barana rahmet û zanîne bi ser wan de nebariye. Ne bihemlî Mesîh in! Ezeb in, loma bi hêsanî telaq didin; bi hêsanî merivan xerc dikin.

Ne hazir in ku ti tiştî bidin kesî, lê dixwazin bibin xwedyê her tiştê ku dilê wan dixwaze.

Ne hazir in ku azadiyê bidin kesî, lê dixwazin azad bin, weke kerê ku li çolê diçêre, weke gurê ku azadiya qirkirina berxan dixwaze.

Bi baweriya min, dinya ji kişandibe, ji

•  
*Derdê  
dinyayê,  
berî ku  
derdê  
parvebûn  
û ji hev  
cudabû-  
na teşkî-  
lat û ra-  
amanan  
be, derdê  
dogmatî-  
kiyê ye.  
Lewra  
dinya ji  
çi kişan-  
dibe, ew  
tişt, eserê  
dogiman  
e.*

•  
*Naxwe  
gereke  
dijminê  
me, ne  
raman û  
teşkîlat  
bin.  
Gereke  
dijminê  
me, mi-  
rovên  
dogim  
bin.*

# AZADÎ HEQÊ HERKESÎ YE

•  
**Di îslamiyetê de distûrek heye: Mirovek ji bo xwe çi dixwaze, divê ji bo birayê xwe yê momîn jî wî tiştî bixwaze. Ev hem ji bo jiyana axîretê, hem jî ji bo jiyana dinyayê wisa ye. Heger nexwaze, îmana wî kesî tam nîne; kê m e.**

Pir normal e ku mirov fikrekî bipejirîne û li gor wî fikrî rêya xwe bimeşîne. Ji bo pêşdebirina fikrê xwe heqê wî mirovî heye ku xebatan bike û xweşiyên fikrê xwe nîşan bide. Ev rewş ji bo hemû grûb û kesan divê di mer'iyetê de be. Di civakêkî de herkes divê ji bo pêşdebirina fikrê xwe bikaribe xebatê bike û kom û civînan bi cih bîne û kes ji kesî re nebe asteng. Encax wê wextê ew civak pêş de diçe. Di vê çarçivê de, divê mirov azad be û kes zerarê nede ti kesî. Herkes li ser pêşdebirina fikrê û ramanê îdeolojiya xwe de, di xebatên xwe de divê serbest be. Divê herkes bi azadane bifikire û di kiryarên xwe de azad be.

Di îslamê de azadiya mirovan bi temînat hatiye parastin. Yek mirov li gor îslamê ne dikare zerar bide xwe, ne jî dikare bide kesekî din. Yanê can û mal û namûs û hemû heq û huqûqên herkesî di bin temînatê de ne. Mirov heta zerarê nede xwe û nede kesekî din, azad e

û di kiryarên xwe de serbest e. Di derheqê azadiyê de tarîfa îslamê jî ev e.

Di îslamiyetê de distûrek heye: Mirovek ji bo xwe çi dixwaze, divê ji bo birayê xwe yê momîn jî wî tiştî bixwaze. Ev hem ji bo jiyana axîretê, hem jî ji bo jiyana dinyayê wisa ye. Heger nexwaze, îmana wî kesî tam nîne; kê m e. Meselen, ji xwe re mal û mulk bixwaze, divê li ber mal û mulkê kesên

zî nîne. Ji tarîxa dîr heta roja îro ev rewş wisa ye. Kesê ji bil feyda xwe tiştekî nefikire, her cûr tiştî jî bo feyda xwe bi cih bîne, ti millet wî xweş nabîne. Yanê kesê ku ji xwe re çi bixwaze, ji xelqên din re jî xwestina wî tiştî, distûreke însanî û îslamî ye.

Hinek mirov di fikrên xwe de pir hesûdiyan dihewînin. Ji xwe re serfiraziyê dixwazin, lê kesên li dijê xwe di bêsêrûberiyê de dixeni-



din hesûdiyê neke. Ji xwe re pere û mewqî bixwaze divê ji birayê xwe re jî bixwaze. Çarçiva ku dîne îslamê ji me re daniye ev e.

Di nav civakên ku ne misliman in de jî, mirovên ku ji bo xwe tiştên baş, ji bo kesên din tiştên nebaş dixwazin, xweş nehatine dîtin. Ji mirovên, partiyên û grûbên wisa ti kes ra-


qînin. Bi xwe her roj şêrînayiyê tam dîkin, têr nabin. Ji xelqê re wê nîmetê pir dibînin, wan mahkûmê tehlîyê dîkin. Xwe layiqê zengîniyê dibînin, xizaniyê jî, ji kesên din re dixwazin. Tim û tim pêşdeçûyinê ji bo xwe tenê dixwazin. Kesên ku ne ji wan in jî mahkûmê paşde mayinê dîkin. Serbestî û azadiyê ji xwe re di-



kin mal. Kesên ku dijê wan in, dixwazin tim bindest bin.

Çi kes dibe bila bibe, heta ku tiştê ji xwe re layiq dibîne, ji kesên din re pêwîst nebîne, van nîmetan ji wan re pir bibîne, bi rastî bi xwe jî ne layiqê wan tiştan e.

Kurda ji zamanê berê heta roja îro nav xwe de fikrê xoşdîtinê, nehewandî ne. Kê li kê hukim kiriye, negotiye “ez dijim, bila ew jî bi-



je.”, heyat nedaye reqîbê xwe. Ji eşîrtiyê, kurdên reben pir kişandine, mîna berê nebe jî hê jî dikşînin. Eşîrtiyê piştta kurdan şikenandiyê. Qeweta kê zêde be, li yê zeîf zilm û zordarî kiriye. Ez tim dibêjim, dijminê kurdan yê tewr mezin cehalet e. Yanê nezanî ye. Mirov wextê zana dibê, mana jiyane û di ji-

yanê de wê çawa hereket bike, fam dike. Qusûrên xwe kê mî dike û roj bi roj bi pêş de diçe.

Di nav kurdan de, ez bawerim ku, hevûdu xoşdîtin hê bi tevayî cih negirtiye. Lêbelê em bê hêvî nînin; kurd roj bi roj hevûdu xweştir fam dikin.

Grûbên kurdan serbestiya ku ji xwe re dixwazin, eceb sibê îdarê bi destên wan bikeve ma wê, wê serbestiyê bidin grûbên din? Ez bi navê xwe dixwazim vê şubhê ji mejiyê xwe bavêjim.

Em îro da-wa heq bikin û bêheqiyê di jiyana xwe de bimeşînin û wextê ço bikeve destê me, heqê ku me ji xwe re dixwest, em nedin kesên din, em

ê vê hereketa xwe çawa îzah bikin?

Azadî û serbestî heqê herkesî ye. Hemû kes di hereketên xwe yê meşrû de serbest in. Îmana mirov çiqas bi qewet be, ewqas nêzîkî azadiyê dimeşe, ewqas zêde azad dibe. Kesê ji ebdiya mirovan xelas bibe, nêzîkî Xwedê dibe û wezîfên ku Xwedê daye wî, tîne cih. Kesê xwe-

diyê îmana heqîqî, ji bil Xwedê ji ti kesî re nabe ebd. Ev kes ne dixwaze li kesî zilmê bike, ne jî zilmê li ser xwe qebûl dike. Lewra baweriya ku bi Xwedê aniye, nahêlê ti kes zilmê li wî bike, li ti kesî jî ti car zilmê nake.

Di civakê de em cûr cûr mirovan dibînin. Rast û çewt, baş û nebaş, di vê civakê de bi hev re dijîn. Yek ji xwe re, ji hevalên xwe re, yanê ji grûba xwe re serbestî û azadiyê bixwaze, ji grûbên din re nexwaze û bi zilmê heqên destên wan de ne bistîne, em ê çawa bi hev re bijin? Ev rastî bila ti car jibîr nebe ku; fikr bi zilmê û zordestiyê li ti cihî nehatine qebûlkin.

Mirovek baweriya wî çî dibe bila bibe, dixwaze bila misliman be, dixwaze bila nebe, heger durûtiyê nake, hesûd û ezperest nîne, ji bo xwe di heqên însanan de çî dixwaze heger ji xelqê biyanî re jî bixwaze, ew mirov bi rûmet e û mirov dikare pê re hevaliyê bike. Na heger xweperest e, ji bil fikrê xwe ji ti fikran re destûra jiyane nede, ew kes ne hevalî pê re dibe, ne jî ewleyî. Bi xwe jî layiqê ti heqekî însanî nîne. □

•  
**Di nav kurdan de, ez bawerim ku, hevûdu xoşdîtin hê bi tevayî cih ne girtiye. Lêbelê em bê hêvî nînin; kurd roj bi roj hevûdu xweştir fam dikin.**  
•

# AZADÎ Û EZPERISTÎ HERDU LI CÎKÎ NABIN

•  
**Heger li civakekê dîktatoriya grûbekê, yan jî dîktatoriya ramanekê hebe û ji bil ramana serwer, bedela xwediyê ray û ramanên din, zindan û kuştin be... Heger arzûya xwediyê dar, bi darê zorê dibê arzûya hemû mirovan... Li wê civakê qala serbestiyê, azadiyê, huzûrê û xweşbextiyê nayê kirin.**

Heger di civakekê de mirov bi darê zorê mecûbûrê qebûlê, yan redê dimînin...

Heger li hember peyvê, cûrbicûr asteng û tirs hebe...

Heger li civakekê dîktatoriya grûbekê, yan jî dîktatoriya ramanekê hebe û ji bil ramana serwer, bedela xwediyê ray û ramanên din, zindan û kuştin be...


Heger arzûya xwediyê dar, bi darê zorê dibê arzûya hemû mirovan... Li wê civakê qala serbestiyê, azadiyê, huzûrê û xweşbextiyê nayê kirin.

Di wê civaka kambax de, hêrgiz qala îlm û îrfanê jî nayê kirin. Ji vê civakê hêviya îstîqbaleke spehî nayê kirin. Jixwe qala azadiyê her û her nayê kirin.

Heta niha, bi sedan mînak li ber çavan çebûne ku, civak an grubên ezperist û dîktator, ku bi zordariyê, bi tirsandin û bi redkirina her cûr ray û raman, hukim kirine, di îlmê de, di huner de, di edebiyatê de, di aboriyê, axir di hemû cîhetên jiyane bi felişan-

dinê re rûberî hev bûne. Lewra bîr û rûhê mirov, di binê zordariya hêzek ezperist de, ne mumkin e ku karibe xebateke berdar bike.

Gava ku hemû xebatên mirov di bin siya



dîktatoran de be û rê ji rizgariya mirov re nebe, ma wê çawa şop û eserên rûgeş ava bibin?

Lê mixabin destûra vê di kitêba ezperistiyê de tineye. Lewra tehmula dîktoriyê ji tiştê nû re tineye. Hemû xebatên ku bêtin kirin, divê ku ji dîktatoran re bibin qewet.

Lewra li gor ezperistan, rastî tenê ya wan e. Kî çiqasî jî bixebite û ray û ramanên nû peyda bike jî, pir pir wê gi-

haştibe rastiya van ezperistan. Naxwe, hevçend astengî û zehmetî ji bo çi?

Loma, ji ya ezperista pêvtir, her çi peyiv û raman hebin, merdûd in û lazime ji holê bête rakirin.

Hebûn û nebûn ew in û piştî wan jî jixwe jiyana wê betal bibe.

De ka, di bin siya zordariyê, ezperistiyê de, hêviya hêşînûna bîr

û baweriyana wê çawa bête kirin?

Wê ewletî çawa çêbibe? Mirovek gava ku sibehê ji malê derket derve, gelo êvarî wê dîsa karibe vegere mala xwe? Hetta wê karibe di mala xwe de bisitire?

Heger civakek an ramanek, tevgera xwe li ser yekawayî û ezperistiyê danîbe, kî dikare qala huzûrê di wê civakê de bike? Kî dikare

bibêje ew civak an ev grûba ezperist, wê azad bibe û payidar bimîne? Grûbek an jî wargehekî ezperist, bi çî rûyî doza hev-kariyê û dilsoziyê ji mirovan wê bike. Jixwe 'dozkirin' nîne, 'fermankirin' karê ezperista ye. Ji ber vê ye ku ne ev grûb azad dibe, ne jî kesî kare azad bike.

Civakek wisa mahkûmê bindestiyê û tenêtiyê ye û ti carî ji kambaxiyê û ji felişandinê jî rizgar nabe. Lewra azadî, li ser zemîneke azad hêşîn dibe û bejnê dide.

Encax, grûb yan jî civakên ku rizgariya bîr û baweriyên, rizgariya ray û ramanan nas dikin, qedr û qîmet didin mirovên zana, tehemûlê ji her cûr fikran re dikin, layiqê azadiyê ne. Civakên, azadiya mirovan ne li gor ray û ramana wan, lê ji ber ku mirov in azadiyê qebûl dikin û rûmet didênê, layiqê azadiyê ne. Encax civakek wisa, jiyaneke bi îstîqrar kare bibe.

Civak û grûbên ku ji ezperistiyê xwe diparêzin encax layiqê azadiyê ne.

Heger kes an grûb bi kar û tevgerên xwe, amîniyê nexin dilê mirovan û ray û ramanên mirovan nedin ber çavê xwe, bila ne qala azadiyê bikin û ne jî zehmetiyê bikşînin.

Heger rengê roja me û civaka me, bê tehemulî, ezperistî û bê ewletî be û heger tev vê rewşa kirêt, em azadiyê û serfiraziyê jî dixwazin, divê ku em rûnên yan jî em rabin û bihênjin.

Lewra azadî û ezperistî bi hev re nabin. □

## FEXRA EHLI ÎMAN, SE'ÎD

*Menbe'a 'ilm û heqîqet sirri 'irfanî Se'îd  
Şahi texti seltenet îro panwanî Se'îd  
Her minnetkar in ji te islami huccet ma tu yî  
Sed qesem îro tu fexra ehli îmanî Se'îd  
'Alema erz û seamaan masiwayî Zati Hey  
Hey kirî îro bi kenza sirri furqanî Se'îd  
Şewq û feyza te bide qet 'aynî îman e yeqîn  
Lew dinalim hê dibêjim derdi dermanî Se'îd  
Feyz û sirra wan îşarat û meqalatî Nebî  
Ku hilanî perdeya ser herkesî zanî Se'îd  
Gewhera rûhî xulûsiyyet bi te hate xuya  
Ne bi te se'di bû se'dî qutbî cihanî Se'îd  
Ez demî bexşî kirî irşad û himmet ji te ra  
Hikmet û burhan û heq da te burud zanî Se'îd  
Hîj di ber qalû bela î emri kun da te Xuda  
Kun lî 'ebden muxlisen beynel berayanî Se'îd  
Şubhi zer xalis û muxlis li te be ew silsila  
Ku neda zanîn bi xelqi murşidî fanî Se'îd  
Hikmet û burhani tefsîl bi me zanîn te kirî  
Muhkemû ehkamî ayatî di furqanî Se'îd  
Tifl û mal û can fedakarim ji bona te hemî  
Çunki bê şek ez dizanim xewsî cihanî Se'îd  
Zahidî bê çare me dil aşiq û mehzûn im ez  
'Eskerî himmet telebkar im tu 'unwanî Se'îd*

*Mele Zahid Hezrowî*

### KITÊBÊN ME YÊN LI BER ÇAPÊ:

- 1) Nimêj Dikim
- 2) Bediuzzaman'in Volkan  
Yazıları  
**nûbihar**

# MAQAMA DUYEM A PEYIVA SÊZDEM

•  
**Madem ecel ne kifş e. Her gav dibe ku were û serê mirov jêke û ferqa xort û îxtiyara tine ye. Helbet insanê reben di miqabilê vê mesela mezin ya ecêb û bi tirs de, li çara xelashûnê bigere; îdama ebedî, hepsa bitenê û deriyê qebrê ji bo xwe wergerine deriyê alema baqî û seadeta ebedî û alema nûr; ev mesele jî, ji wî insanî re meseleke mîna dinyayê mezin e.**

(Qisekirinek bi hinek xortên ku di nav fitneke cazibedar de ne û hîna aqlê xwe wenda nekirine.)

Hinek xortan gotin: "Di nava van hewesat û kêf û gunehê xapenok û cazibedar de em ê çawa axîreta xwe xelaskin" û ji Rîsaleyên Nûr meded xwestin. Min jî li ser hesaba şexs î mane-wî ya Rîsaleyên Nûr ji wan re got:

Qebir heye, ti kes nikare înkâr bike. Bibê nebê wê herkes bikeve wir û ketina wê derê jî, ji xeynî "sê rêya" ti rê tineye.


*Rêya yekem:* Ji bo ehlê îmanê deriyê alemeke ji vê dinyayê xweştir e.

*Rêya duyem:* Ê ku axîretê tesdîq dikin, lê di rêya sefahet û delaletê de diçin, ji wan re hepseke ebedî û ji hemû dostan dûr, deriyê hepseke munferîda bi tik û tenê ye. Ji ber ku wisa dibîne û wisa îtîqad dike û li gor bawerîya xwe hareket nake, wê wisa muamelê bibîne.

*Rêya Sêyem:* Ji bo ehlê înkâr û delaletê deriyê îdama ebedî ye; yanê dara îdamê ye, ya ku wê him wî û him jî

kesê ku jê hez dike, îdam bike. Ji ber ku wisa dizane, wê cezaya wî jî eynî wisa be. Ev herdu rêyê eşkere, ne hewceyê delîl in, bi çav xu-

wergerine deriyê alema baqî û seadeta ebedî û alema nûr; ev mesele jî, ji wî insanî re meseleke mîna dinyayê mezin e. Ev heqiqeta qat'î ya ku sê wezîyetana bi van sê rêya dibin û sed û bîst û çar hezer muxbirê sadiq (Pêxemberê din, yên ku xeberên rast û mezbût didin W.) di destên wan de mu'cîzên ku nîşaneyê tasdîq dikin hene. Ev enbiya û xeberên ku



ya dibin. Madem ecel ne kifş e. Her gav dibe ku were û serê mirov jêke û ferqa xort û îxtiyara tine ye. Helbet insanê reben di miqabilê vê mesela mezin ya ecêb û bi tirs de, li çara xelashûnê bigere; îdama ebedî, hepsa bitenê û deriyê qebrê ji bo xwe

dane re sed û bîst û çar milyon ewliya jî, ji eynî heqîqatê re şahîdiyê dikin. Bi kifş û zewq ve şahîdiyê dikin û îmze davên. Bi delîlên yên ku li heqîqetê digerin ve eynî ev xeberên ku ewliya û enbiya didin-aqlen bi dereca îlmelye-

qîn de(★) îspat dikin. Tev bi îtîfaq îxbar didin ku; nod û neh ji sedî “xelasbûna ji îdam û zîndana ebedî û wergerandina wê rêya seadeta ebedî encax bi îman û îteatê tenê de ye.”

Gelo rêyeke yek ji sedî ihtimala helakê tê de be, bi gotina şexsekî kesê guhê xwe nediyê here, ji ber endîşa helakê û elema manewiya ku îştaha wî direvîne,



ev rêya bi gotina sed hezaran muxbirê sadiq, ji sedî sed ihtimala delalet û sefahet dide. Sebeba îdama qebrê û hepsa ebedî ya bitenê qet'î dibêjin. Îman û îbadet ji sedî sed wê dara îdamê hiltîne û deriyê wê hepsa bitenê

digre û vê qebra li ber çava vedigerîne deriyê xezînake ebedî û qesra seadetê û eser û îşaretên wî nîşan didin. Însanê reben, xusûsen misliman eger ko îman û îbadeta wî tinebe, seltanet û lezzeta dinyayê tev bide mirovekî, gelo ma dikare wê endîşa elema mezin rake, ya ku her daîm dipê dora wî were û here wê îdama ku li ber çava ye? Ez ji we

dipirsim.

Madem îxtiyarî û nexweşî û mûsîbet û li her dere mirin vê elema pirr bi tirs dikolin û tînin bîra mirov. Helbet ew ehlê delaletê û sefahetê sed hezar lezzet û zewqa bistîne jî, disa ew cehenema manewî di

qelbê wî de ye û dişewitîne. Lêbelê sersemtiya xefletê ya pirr stûr (qalind) bi wî nade hêsandin.

Madem qebra li ber çava xuya dike û di derheqê ehlê îman û taetê de dibe deriyê xezînake ebedî û seadeteke layezeli. Bi wesîqa îmanê jî, ji wê piyangoya muqederata ezeli bi mîlyara zêr û elmas dide qezenckirin û yek bilêtekî jî, jê re derketiye. Her wext li hêviyê ye ku, jê re bibêjin “were bilêta xwe bistîne”. Û ji vê çavnêriyê tameke heqîqî û zewqeke manewî distîne. Lezzeteke wisaye ku: Bibe cism û ew dendik bibe darek, ji wî însanî re dibe mîna cenneteke xusûsî. Ew, terka wî zewq û lezzeta ezîm bike, bi sebeba ciwanîyê li dû lezzeteke muweqet sefîhane û heweskaraneyê xeyrî meşrû here, mîna hingivekî bi jahr, ku bê hed elem tê de ne, ji heywan sed car nizmtir dibe. Mîna ecnebiyê (biyanî) bê dîn jî nabe. Lewra ew pêxembera nizanibin jî, dikarin Xwedê nas bikin. Ko Xwedê nas nekin jî, dibe ku xuyê başê ku bibin sebeba kamîlbûna wan hebin. Lêbelê mislimanek bi wasita Muhammed ê Erebi Aleyhisselat û Wesse-

•  
**Îman û îbadet ji sedî sed wê dara îdamê hiltîne û deriyê wê hepsa bitenê digre û vê qebra li ber çava vedigerîne deriyê xezînake ebedî û qesra seadetê û eser û îşaretên wî nîşan didin. Însanê reben, xusûsen misliman eger ko îman û îbadeta wî tinebe, seltanet û lezzeta dinyayê tev bide mirovekî, gelo ma dikare wê endîşa elema mezin rake, ya ku her daîm dipê dora wî were û here wê îdama ku li ber çava ye?**  
 •

•  
**Belê hey  
 bêça-  
 reyên ku  
 ji bo zew-  
 qa heyata  
 dinyayê  
 nexweş û  
 ji bo ku  
 heyata  
 paşerojên  
 xwe te-  
 mîn bike,  
 yên ku  
 cehd di-  
 kin! Ko  
 hun kêf û  
 seadeta  
 dinyayê  
 dixwazin,  
 bi kêfa  
 ku di daî-  
 ra helal  
 de ye qe-  
 naet bi-  
 kin. Ew  
 besî kêfa  
 we ye. Di  
 xarîcê wê  
 de helbet  
 we fam-  
 kir ku di  
 daîra ne  
 helal de,  
 nava lez-  
 zetekî de  
 hezar  
 elem he-  
 ne.**

•

lam, him embiya, him Rebbê xwe, him hemû însaniya bilind dizane. Yê ku terbiya wî berde û ji zincîra (helqerêz) wî derkeve êdî ti pêxemberî nasnake, digel Xwedê jî nasnake û ruhê wî de esasê ku kamilbûna wî biparêze jî namîne. Lewra daweta ji pêxambera tewr dawîn û tewr mezin ji bo ku li hemû însaniyetê dinêhêre û ji aliyê mu'cîza û dîn ve bilind û bi qîmet e. Kesê ku bi heqîqetê ustadiya (mualimiya) hemû însaniyetê kiriye û çardeh qirne (esr) bi sûreteke pak ve îspat kiriye û bûye sebeba pesna. Mirov esasê terbiyê û dînê zatekî wisa terk bike helbet bi ti şiklî nûr û qîmet û biha nabîne. Mahkûmê derêmayê însaniyetê ye.

Belê hey bêçareyên ku ji bo zewqa heyata dinyayê nexweş û ji bo ku heyata paşerojên xwe temîn bike, yên ku cehd dikin! Ko hun kêf û seadeta dinyayê dixwazin, bi kêfa ku di daîra helal de ye qenaet bikin. Ew besî kêfa we ye. Di xarîcê wê de helbet we famkir ku di daîra ne helal de, nava lezzetekî de hezar elem hene.

Eger bûyerên mazî, yanê zemanê borî çawa bi sînemê, halê hazir de nîşan didin, ko mîna wî ehwalê ayende (îstîqbal), mesela piştî pêncî sala, halê ehlê safahetê bi sînemakê hatibûna nîşandin, ji tiştê ku niha pê dikenin wê vejeriyana û bi sed hezaran nifir û nefret bikirina û bigriyana.

Ê ku li dinyayê û axiretê dilxweşiya daîmî bixwaze, divê di hava daîra îmanê de terbiyeyê Muhammedî ji xwe re bike rehber....

(★) Ku yek ji wan jî Rîsaleyên Nûr e, li meydanê ye.

Ji tirkî: Salih Akgül

## EZ Ê BÊBEXT

Wicdana min dinale  
 Dibêje ev çi hale  
 Gelo tu şiyar nabî  
 Ev xwehîrtî çend sal e

Dînê xwe nebûm xwedî  
 Kor bûm min dijmin nedî  
 Ku ez ji ol dûr ketim  
 Heliyam hêdî hêdî

Weke Seîd nebûm nûr  
 Wek Silhedîn nebûm şûr  
 Dijmina ez xapandim  
 Ez kirime xewa kûr

Vala mane nûr şikeft  
 Bê feqî mane mizgeft  
 Ya ku hatye serê min  
 Ne carek ne heftê heft

Bêav maye dara min  
 Bixwîn Nûbihara min  
 Ez halê wê napirsim  
 Xerîb maye yara min

Rîsaleyê Nûr bêkes  
 Wana naxwazin teres  
 Ez ê kengî bixwînim  
 Bêjim ev teralî bes

Ellahê me Settar e  
 Destê wî de ye çare  
 Bila qurbana heq be  
 Ev Raîfê Bêçare

Raîfê Bêçare

# NAMEYÊN BÊCEWAB / 10

## 2 Nîsan 1991

Gereke ji te re bibêjim ku ez hatime jibîrkirin  
Ji park û baxçeyan zêdetir  
Ji cade û dîwaran zêdetir  
Hişk bûne sinîr û demar û destê min

Qender delala min jî ez jibîr kirime herhal  
Zêdetir ji wê ku fir'ewna koleyan jibîr bikin  
Ez kêrî wê jî nayim ku pîramîdan re bibime xerc  
Qender di Sedda Çînê de jî nabe kevirek êdî bedena min

Xweşa bi halê yên ku li Dêrsimê bi singo  
Hatî perçekirin, bi qesta ku heyfe li wan fişeng werin xerckirin  
Lewra ez bêyî singo dimrim, hêdî hêdî hişk dibin demarê min  
Ez hatim jibîrkirin, berî ku zilm û tevkuji jibîr bibin

Ax, gelo wê çi bimîne ji min li pişt min  
Wê çi ferq hebe di nav min û bav û bapîrê min de  
Ji bil reqemek, agahiyêke îstatîstîkî, kêr, nekafî  
Ez ê bibim çi, ji bil cesedek mîna nûha, ya talî

Ma wê bêtin rehmê, wê min bibexşin zarokê min  
Ji ber ku min ji delalê xwe re mêras hişt  
Vê mirina dem bi dem, ji dergûşê heta gorê  
Hişkbûn, jibîrbûn, xalîbûna kamil ji manê

Ez di nav du agirên de hatime jibîrkirin  
Loma li eleyhê min e, ez vegerim kîja alî  
Ez jîyanek di eleyhê xwe de dijim çar naçar  
Herhal li ser kaxeza jî hişk dibe nûha hebûn û nebûna min

### Sabah Kara

# ÎSLAMIYET

•  
**Çiqas fe-  
 zîlet û  
 tiştên bi  
 feyde he-  
 ne, hemû  
 di îslamê  
 de ne. Çi  
 ku qen-  
 ciyê di  
 dînên ke-  
 vin de he-  
 ne, hemû  
 di îslamê  
 de kom  
 bûne.  
 Îzzet û  
 şeref û  
 îtîbar he-  
 mû di îs-  
 lamê de  
 ne. Kesê  
 ehkamên  
 îslamê  
 tetbîq bi-  
 ke, ew ê  
 ezîz bibe.  
 Çi kesê li  
 huzûr û  
 seadet û  
 muweffe-  
 qiyetê bi-  
 gere, bila  
 ehkamên  
 îslamê  
 tetbîq bi-  
 ke.**

Çiqas fezîlet û tiştên bi feyde hene, hemû di îslamê de ne. Çi ku qenciye di dînên kevin de hene, hemû di îslamê de kom bûne. Îzzet û şeref û îtîbar hemû di îslamê de ne. Kesê ehkamên îslamê tetbîq bike, ew ê ezîz bibe. Çi kesê li huzûr û seadet û muwefqiyetê bigere, bila ehkamên îslamê tetbîq bike.

Xwendevanên delal, ez dixwazim çend xusûsiyetan ji dinê me yê mûbîn bînim bîra hewe:

1- Di dînê îslamê de, Xweda yek e, bê şîrîk e, navê Wî Ellah ezze we celle ye. Ellah Teala, xwedayê hemû kes û mexlûqan e. Ji xwe aqlê însanan jî dixwaze ku xweda yek be.

2- Dînê îslamê, îlmê rûhî tenê nîşanî însanan nedaye. Di îşê wan yê dinyewî de jî rêzanî ji bonî wan kirye. Yanê rîya seadeta dinyayê û axîretê vêk re nîşanî wan daye.

3- Di îslamê de însan masûm, yanê bê guneh tete dinyayê. Însan encax wextê bi aqil û balix dibe, hingê ji şol û amelê xwe mesûl dibe.

4- Di dînê îslamê de, îbadet û dua û tobeki-

rin di navbera însan û Xwedê de ye û hewce-dariya qasida tineye. Yanê ti kes nikare bike-ve navbera Xwedê û ebdên Wî.

5- Çiqas kesên misliman hene, ji çî nijad û netewe û reng û memleketî dibin bila bibin, hemû birayê hev in. Di huzûra Ellah Teala de

sanên din îsanek e. Wezîfa wî ew e ku, emr û fermanên Ellah Teala teblîxî mirovan bike. Îslamiyet hemû pêxemberan qebûl dîke û ji hemîyan re hurmeteke pir mezin digre. Pêxember ji hemû cîhetan ve, ji merivan mezintir e.

7- Dînê îslamê, dî-neke pir mantiqî ye. Di



hemû wekî hev in. Ti ferq di navbera wan de nîne. Merivên misliman, gava ku nimêj dîkin, hemû dikevin milên hev. Mezin biçûk, feqîr dewlemend, zana û nezana, gundî bajarî, mîna didanên (diranên) şehik, dikevin milên hev û bi hev re îbadet dîkin, ji bo Xweda yê xwe yî mezin ezze we celle.

6- Di dînê îslamê de, pêxember jî wekî î-

kitêba mislimana Qur'an a Kerîm de qet'iyyen ti hukmên neyên famkirin û tiştên veşartî tine ne. Disa tu hukmên ku ne mumkin e bête tetbîqkirina li jînê û îlmê fennî wî qebûl neke di Qur'an a Kerîm de tine ne. Emrên Qur'an a Kerîm hemû gelek bi feyde ne. Qet'iyyen di dînê îslamê de xurafe tine ne. Mirovê misliman, ji bil



Allah Teala, îbadeta pût û resman û heykelan û ti tiştên din nake.

8- Îbadetên misilmanan pir bi feyde ne. Meselen, nimêj, ji boyî ku wextên nimêjê mu-eyyen in, nîzam û întîzamê dixwe jiyana însanan de. Bi girtina rojîya meha Remezanê, îrade û hakîmiyeta mirovan li ser nefsa wan pir qe-

xwîxweşiyê li însanan dike. Di îslamiyetê de sirf qencî heye. Evînî, devlikenî, zarxweşî û durustî pir muhîm in.

11- Îslamiyetê, araq û qumar û çî tiştê ku serxweşiyê çêdike heram û qedexe kiriye. Çiqa xirabiyên mezin hene di dinyayê de ji van tiştan çêdibin.

12- Îslamiyetê, jiya-

ye ku ji zanayên biyanî pir kes henin ku piştî lêkolînên xwe yên li ser îslamê, misilmantî pe-jirandine û hê jî kesên ku îslamê hildibijêrin hene.

14- Îslamiyet ji însanan dixwaze ku tim î tim bixebitin. Peyxemberê me Muhammed Mustafa sellellahu eleyhî we sellem dibêje: "Welî ji bo dinya xwe bixebite, herwekî tu namrî. Ji bo axreta xwe jî wisa bixebite herwekî tu wê sibe bimrî."(1)

16- Îslamiyetê gelek qîmet û heq daye jinan. Allah ezze we celle weha ferman kiriye: "Ka çawa (heqên) mêran bi şiklekî meşrû li ser jinan hene, mafên jinan jî li ser wan hene."(2) Resûl ê Ekrem eleyhis-salatû wesselam dibêje: "Cennet di bin pêyê (lingê) daykan de ye."(3)

17- Îslamiyetê pir qîmet daye xwendin û zanabûn û îlmê. Di îslamê de, xwendin, fermana yekemîn e.(4) Di ayetekî din de Allah Teala halo ferman dike: "Ma zana û nezan dibin wekî hev?" (5)

(1) Ibnî Esakîr

(2) Beqere: 228

(3) Xetûb

(4) Eleq: 1

(5) Zumer: 9

•  
**Îslamiyetê pir qîmet daye xwendin û zanabûn û îlmê. Di îslamê de, xwendin, fermana yekemîn e. Di ayetekî din de Allah Teala halo ferman dike:**

**"Ma zana û nezan dibin wekî hev?"**

•


wî dibe. Bi dayina zekat û fitrên Remezanê, feqîr gelek kêfxweş dibin. Bi edakirina heccê, mislimanên dinyayê hemû salê carekê kom dibin û digihêjin hev.

9- Îslamiyetê pir ehemmiyet daye paqîjiya qelb û bedenê. Misliman hemû, berya îbadetê, xwe pak û paqîjî dikin û di pey re dest bi îbadeta xwe dikin.

10- Îslamiyet dewamî tewsiya qencyê û

na piştî mirinê û jiyana gorê û jiyana axîretê pir xweşik îzah kiriye.

13- Qur'an a Kerîm, ji roja hatî û heta îro qet'iyen yek kelîme jê nehatiye guherandin û tehrîfkirin. Ehkamên wê, di her demê de, hewcedariyên însanan bersîv dikin. Kesên xwedî wîjdan û bêteref, gava ku îslamê tetqîq bikin, ew dê bi hêsanî fam bikin ku ev dînê heq e û ji ba Allah Teala hatiye. Ji ber vê yekê



# RÊXISTINA BELAVKIRINA AMOJKARÎ Û WEŞANÊN KURDÎ

•  
**Kesê ji bendên vê bernameyê bendekê tenê jî bîne cih, ew ê ji ser xwe mesûliyetekê werlatparêzî rake. Xebata li ser vê yekê, ne bêdînî ye. Lewra yên vê xebata ha bi rêxistine jî mele û alimên me ne.**  
•

Sal 1918-1919. Di binê siya "Kürt Teali Cemiyeti" (:Cemiyeta Bilindkirina Kurdan) de rêxistinek hate damizrandin: "Cemiyeta Belavkirina Amojkarî û Weşanên Kurdî (:Kürt Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti).

Xebata vê rêxistinê li ser amojkarî û weşanên Kurdan bû.

Vaye heftê û pênc sal borî ye bernameki wek bernameya vê cemiyetê hê tineye. Herhal navê Bedîuzeman Seîdê Kurdî û Xelîl Xeyalî bibînin hun ê jî bawer bikin. Kesê bawer neke bila ji dîrokê bipirse.

Kesê ji bendên vê bernameyê bendekê tenê jî bîne cih, ew ê ji ser xwe mesûliyetekê werlatparêzî rake. Xebata li ser vê yekê, ne bêdînî ye. Lewra yên vê xebata ha bi rêxistine jî mele û alimên me ne.

Niha em ê çend lib bendê bernameya vê cemiyetê binvîsin. Hun jî li ser wan bihêzirin.

1) Weşaneke heftayî wê bê weşandin.

2) Hemû berhemên hozan û alimên Kurd wê bîn çapkirin

3) Ferhengeke ku hemû zaravên Kurdî (Kurmançî, Zazakî, Soranî û Lorî) bigire nava xwe, wê were amedekirin û bête weşandin.

4) Rêzimanekê Kurdî wê were çapkirin.

5) Pirtûkên ji bo dibistana pêşin wê were weşandin.

6) Pirtûkek li ser dîrok û coğrafyaya Kurdan wê bê nivîsandin û weşandin.

7) Ji hemû zaravên Kurdî weşandin a "Pêşgotinên Me".

8) Damizrandina Fakulteke Amojkarî.


Van bendan nivê bername jî nînin (Kesê dixwaze hemû bixwîne bila li pirtûka İsmail Gölbaş, *Kürdistan Teali Cemiyeti*, rûpela 243 ya mêzeke).

Ev bername di rojnameya *Jîn* de hejmara dehemîn de hatiye we-

şandin.

Dîroka rast, di rêya pêşveçûnê de çira ye. Ger mirovek dîroka dinayê û taybetî ya gelê xwe zanibe û jê ders bigre, wê pêşiya xwe ronî bike.

Em Kurd, bi taybetî Kurdên misliman dîroka xwe nizanin. Ji ber vê qasê hemû tiştên ku li ser Kurdan heye, ketiye destê çepiyan. Li cem me, xebata li ser van yekan bêdînî tê zanîn. Halbukî ji bo me mislimanan (Ereb, Pers, Tirk, Kurd ferq nake) ev yeka kêmasiyek e. Lewra bingeha van xebata mele û zaneyên ba-



wermend avêtiye.

Pêwist e êdî em serê xwe ji xewê rakin an jî ji qûmê derînin. Li ber rojê çavên xwe vekin. Li ser van yekan bêtirs binvîsin û biaxifin. Dîrok jî alîkarê me ye. Rêxistina Belavkirina Amojkarî û Weşanên Kurdî jî, ji deh mînaka mînakek e. □

# ÊDÎ JI XEW RABIN, RAZAN BES E!

•  
**Koçberî,  
xizanî,  
tevkujî,  
bindestî,  
zilmî û  
hwd...  
Van derd  
û birînan  
dîrokê  
de bi  
Kurdan  
re hevaltî  
kirine û  
hîna jî ev  
halana  
hevaltiya  
xwe dido-  
mînin.  
Heger  
em van  
derd  
û birînan  
hal û fêsl  
nekin, wê  
hîna zehf  
hevaltiya  
xwe bidom-  
mînin.**

Koçberî, xizanî, tevkujî, bindestî, zilmî û hwd... Van derd û birînan dîrokê de bi Kurdan re hevaltî kirine û hîna jî ev halana hevaltiya xwe didomînin. Heger em van derd û birînan hal û fêsl nekin, wê hîna zehf hevaltiya xwe bidomînin.


Ey Kurdên reben, li halê xwe mêzekin, dijmin çawa we xapandiye, bizanin!

Ey xuşk û birano! Hun tew difikirin ku gelê me îro çima mazlûm û kole ye. Çima Tirkîyê û Iraq û Îran û Sûrî û Rûsiyê her yek ji hêlekê welatê me ji destê me girtine, me perçe perçe kirine û tixûb di nava me de kişandine? Gerdûn dijminê me ye, em jî dijminê gelê xwe ne, çima? Çima wisa ye?

Nufûsa Kurdan îro li dorê 50.000.000'î ye. Erdê welatê me 500.000 km<sup>2</sup> ye. Lêbelê dewleteke me yê serbixwe tune. Gelo nufûsa me ji ya Iraqê, Sûrî, Kuweytê, Urdunê, Israîlê, Lubnanê û hwd hindik e? Na! Ko tu nufûsa van dewletên serbixwe bide

ser hev û top bikî, dîsa jî qasî me nake. Naxwe ev hal çiyê?

Ceddê me Selaheddînê Eyyûbî ber vî 800 salî xaçiyên ji Qudsê davêje. Ji wê çaxê de Rojava (xaçî) bûye dijminê gelê Kurd. Loma wextê ku Herba Cihanê ya Yekemîn de xaçiyên (Rojava) Sûrî distînin, qumandarê wan heman diçe Mizgefta Emewî,



li ser tirba Selaheddîn Eyyûbî disekine û bi lingê xwe li tirbê dixê û dibêje: "Selaheddîn, em hatin, de rabe, te me ji Qudsê derxistibû wextekî, vaye em dîsa vegeriyan. Ji vir wê de ti kes nikare me ji vir bavêje."

Tu dibîne xuşk û birayê min. Dijmin, dij-

minê xwe jibîr nekiryê û ti carî dev jê bernedaye. Lê em? Em dost û dijminê xwe rind nas nakin. Dijminê me merhebakê bide me, em ji xwe re wî dost dihesibînin û dijminatiya wî jibîr dikin. Lêbelê ew ti carî jibîr nake. Kîjan cara ku fîrset dikeve destê wî, wê gavê derbeke mezin li me xistiye û me xapandiye. Esla halê me ev e. Êdî ranezin, ey Kurdên reben.

Îro gelê Kurd di bin zilma zordestan de jiyaneke bijehr didomîne. Barê giran, karê zor li ser milê Kurdê reben

e. Ometa Muhemmed, gelê me yê misliman jibîr kiriye. Hinek dibêjin ku: "Çima birayê me yên (Ereb, Tirk û Faris) misliman li me nanêrin, alîkariya me nakin? Bira! Hişê xwe bîne serê xwe. Ji xwe van birayên me yê misliman vê zilmê li me dikin. Tevkujî li

ser me çêdikin. Guh bide Seydayê Ehmedê Xanî, dibêje ku: “Vî zemanî herkesek mîmarê dîwarê xwe ye.” Xuşk û birayê min, vê peyvê ji eqlê xwe dermexin. Welat li hêviya me ye. Derd û kulên gelê me li benda me ne. Dijmin li hember me ye. Xwedê Teala alîkarê me be.

Birayê delal, ez hê çî bibêjim. Tu vî halî ji min zehftir dizanî û tu jî di van tengasiyan de dijî. Dest û lingê me girêdane, me zimanê xwe jibîr kiriye. Êdî em nikarin nivîsekê bi rehetî bixwînin, derdê xwe beyan bikin. Lewra me bi xwe, xwe asîmîle kirye (ne Tirk û Ereb û Farisa). Em hîna ji Kurdîtiya xwe şerm dikin. Loma em bi Tirkî û Erebî û Farisî dipeyivin, dinvîsin û dixwînin. Em bi dê û bav û birayên xwe re jî bi Tirkî diaxifin.

Birayê delal, xuşka hêja, de werin, em van tabûyana bişkînin. Ronnesansa Kurdan peyda bikin.

Dijminê xwe yî mezin; nezanî û ixûlafê, bi xwendin û bi tifaqê ji holê rakin. Dewletekî serbixwe li ser şerîet damizrînin. De rabin xuşk û birano, ez wê bibînim.

Xwedê Teala alîkarê gelê mazlûm û mustedefan be. □

# FIKIR

*Fikirîm bi cismek piçûk  
Li dozek mezin  
Fikirîm li doza xwe ya mezin  
Bilind fikirîm  
Mezin fikirîm li fikrên mezin  
Fikirîm, vegeyriyam li fikrê xwe fikirîm*

*Fikirîm bi eqlek rohnê  
Li qewmên bra  
Fikirîm li ometa xwedî mizgîn  
Mezin fikirîm  
Xweş fikirîm li ala çil perçe û rengîn  
Fikirîm, zîvirîm li tarûmariyê fikirîm*

*Fikirîm bi zihnek zelal  
Li neteweyên sedhezar  
Fikirîm li hikûmetên leyiztokên piçûk  
Kûr fikirîm  
Tehl fikirîm li dewletên sihhezarin  
Fikirîm, fitilûm li sih milyon însan fikirîm*

*Fikirîm bi çavên dûrebîn  
Li dîroka dirêj  
Fikirîm li xelqê bindest û azad  
Dûr fikirîm  
Pirr fikirîm li sebebê kêf û binharî  
Fikirîm, vegeyriyam şermende li colên dest û pê xwe fikirîm*

*Fikirîm bi dilaweriyek guhşiyarî  
Li ber dengê Paloyê  
Fikirîm li agirê Dêrsim, Fizara Koçgirê  
Fikirîm li Ararat û Tendûrek  
Fikirîm li Mehabat û Omeran  
Fikirîm li do û îro  
Fikirîm zîvirîm di Zîlan de ji keç û bûkê sunguyan re fikirîm*

*Hiseyn Elî Başar*

# MELE EHMED Ê CIZÎRÎ

•  
**Ango lazimê xwe nayê, ku em li vir derbarê Melayê Cizîrî de zêde binivîsin. Çimkî piraniya Kurdan, ji nêz ve wî dinasin û jê re radiwestin. Heçika ew, serbilindiya me ye û wek tava rojê ye li asîmanê Rojhilata Navîn diçirise. Herweha Cizîrî pîrê hozanvaniya Kurdî ye, lewra ku bûye qada lêkolînê, ji gelek gerok û lêkolvanên biyanî re jî.**

Yek ji helbestvan û nivîskarên Kurd ê bi nav û deng, Mele Ehmed ê Cizîrî ye. Ew di sala 1570 de, li bajarê Cizîra Botan ji diya xwe re çêbûye û di sala 1640 î de jî, çûye dilovaniya xwe û li nav Bajêr di bin qubeyeke Mizgefta Sor de veşartî ye.

Navê wî yê esasî, Şêx Ehmed e. Navê bavê wî Şêx Mihemed e û ji eşîra Bextiyan e. Lê navê wî yê menşûr, Melayê Cizîrî yan Melê Cizîrî ye. Bernavê wî yê menşûrtir, ku wî di helbestan de ji xwe re bi kar aniye, "Nişanî" ye. Herweha "Mela" û "Melê" jî, di hin helbestên xwe de gotiye.

Melê Cizîrî, serê pêşî destpêka xwendinê li nik bavê xwe kiriye. Di pey de li Hekariyê, li Amêdiyê û li Diyarbekrê xwendiyê. Heta tê gotin ku, wî li gundekî Diyarbekirê ku bi navê "Sitrabas" bû, ji dersdarekî bi navî Mele Taha destûrnama xwe wergirtiye. Û piştêre li gundê Sirba meletî kiriye.

Di pey meletiya li Sirbayê de, ew çûye li

bajarê Heskîfê (Hesenkê) ders daye feqîyan û li wir destûrnama daye gelekên.

Îcar piştî ku Mela ji Heskîfê çûye, li bajarê Cizîrê cîwar bûye û heta bi dawiya jiyana xwe dersdariya Mizgefta Sor kiriye. Herweha dest bi nivîsandina eseran kiriye, gelek pirtûk nivîsîne û beyt û helbest nivîsîne.

Belam ji roja wefata Melê heta bi îro jî, gora wî ji xelkê Kurd re wargeya armanc û ramana ye. Hergav xelk diçin ser wî tewaf dîkin û daxwaza gihastina mexsed û armancên xwe jê dipên.

Ango lazimê xwe nayê, ku em li vir derbarê Melayê Cizîrî de zêde binivîsin. Çimkî piraniya Kurdan, ji nêz ve wî dinasin û jê re radiwestin. Heçika ew, serbilindiya me ye û wek tava rojê ye li asîmanê Rojhilata Navîn diçirise. Herweha Cizîrî pîrê hozanvaniya Kurdî ye, lewra ku bûye qada lêkolînê, ji gelek gerok û lêkolvanên biyanî re jî.

Derbarê dilovaniya Melê de, hin tarîxên cuda cuda hene. Çewa ku Pr. Qanadê Kurdo di *Ta-*

*rîxa Edebiyata Kurdî-1*, rûpel 90 de nivîsiye, gotiye ku: Aleksandîr Jaba gotiye Melayê Cizîrî "... di tarîxa pêncsed û çilê de (1145-6) çêbûye û di tarîxa pêncsed û pêncî û şeş de merhûm bûye (1160-1161)"

Dîsa li gor Profesorê Kurd: "Edebiyatnasê Kurd Eladîn Secadî li kitêba xwe *Mêjûyê Edebê Kurdî* de dinivîse, ku "Melayê Cizîrî di sala 1407 da hatiye dinyayê, di sala 1418 mirîye."

Û Pr. gotiye ku: "Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku: Melayê Cizîrî di sala 1101 hatiye dinyayê, di sala 1169 mirîye."

M. Emîn Zekî Beg di *Tarîxa Kurdistan* de nivîsiye ku: "Tarîxa jiyanê wî (M. Cizîrî) her çiqas rast ne kifş e jî, lê meriv kare qebûl bike ku di qirnê şeşanê hicrî de jiye." Û E. Zekî gotiye: "Dîwana wî di sala 1904 an de li Berlinê hatiye çapkirin (*Tarîxa Kurdistan*, Weşanxaneya Komal, Temûz 1977, rûpel: 181 - bi zimanê Tirkî)

Kovara *Hêviya We-lat* jî, di rûpela 65 an de nivîsiye, ku: "Melayê Cizîrî di sala 1002 an de li Cizîrê hatiye gêtîyê (dinê)."

•  
**Dema ku min û heval M. Emîn Narozî di sala 1986 an de Dîwana Melê wergerande tîpên latênî, di beşa destpêkê malika şeşan de, li gor hesabê Ebcedê (Cemel) tarîxa dayikçêbûna wî derket, ku 980 (1570) ê yê hicrî ye.**  
 •

De lêbelê, dema ku min û heval M. Emîn Narozî di sala 1986 an de Dîwana Melê wergerande tîpên latênî, di beşa destpêkê malika şeşan de, li gor hesabê Ebcedê (Cemel) tarîxa dayikçêbûna wî derket, ku 980 (1570) ê yê hicrî ye. Jxwe pir kesan, tarîxa dilovaniya wî bi helbesteke Feqiyê Teyra rast dêrandine, ku 1050 (1640) ye (Dîwana Melayê Cizîrî, Çapa Latênî, rûpel: 21-22)


D. N. Mackenzie jî, herweha tarîxa mirin û jidayikbûna Cizîrî, bi 1570 - 1640 î diyar kiriye û di "Mela-ê Cizîrî and Faqî Tayran, Şêxê Sen'an, Feqê Teyran, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986 rûpel 26" de nivîsiye.

Pirtûka Melê ya herî navdar, Dîwan e. Ev yek diyar e, ku heta niha 13 caran li çapê ketiye. Her çapek jî, bi navê yê ku çap kiriye bi nav e. Çapên wê ev in, ku me li jêr nivîsîn:

- 1- Dîwana Ehmed Mihemed Zivingî.
- 2- Dîwana Taha Ebabekir.
- 3- Dîwana Maî.
- 4- Dîwana Fon Martîn Hartman.
- 5- Dîwana Bexda (Elî Ewnî).
- 6- Dîwana Evdiselam Mûrad Nacî.
- 7- Dîwana Mihemed Şefîq Ervasî.
- 8- Dîwana Hewlêrî.
- 9- Dîwana Mistefa Qeredaxî.
- 10- Dîwana Sadiq Behaedîn.
- 11- Dîwana Hejar (bi şerha zaravê Soranî).
- 12- Çapa Bênav. Ev çap di nav salên 1980-85 de li Tirkîyê derketiye û xwediyê wê ne kifş e.
- Ev çapên ha li jor, tev jî di çaxên başqe û li deverên cuda cuda, herweha bi tîpên Erebbî derketine.
- 13- Çapa Latênî: Ev Çap, gîşt bi tîpên Latênî ye. Çewa ku me li pêş jî

got, min û heval E. N. me bi hevdu re wergerandibû tîpên Latênî û "Çapa Bênav" jî pê re, herdu bi cidekî, dabû çapkirin.

Ev du bend helbestên Melayê Cizîrî ku me li jêr nivîsîne, di nav destnivîsarên berevokên me de bûn. Lê belê ew di Dîwanê de tune ne. Ew herdu bend, berê di Dîwana Kurmancî de jî, bi destên Evdilreqîb Êsiv, li Iraqê, hatibûne weşandin. Lê di nav herdu nivîsaran de, hin cûdayî diyar dibe.



**BEND: 1**

Ey dil were weqt û mecal  
 Da kin senaya hindîyan  
 Ebdal bibin hem laubal  
 Dîsa ji dest wan xemriyan

Dîsa ji dest wan sorgulan  
 Pircan ji xala fulfulan  
 Perde ji tayê sunbûlan

Bend bûm bi dawa bendiyan

Bend bûm bi dawa enberîn  
Şaha ji bin perda berîn  
Rengê siyah jê ku birîn  
Da bête cengê cundiyan

Da bête ceng û herb û şer  
Zulfan ji qewsê bê weter  
Têk daxwurên Turk û Teter  
Deng tete nêva sitiyan

Sotîme dêm ez bûm mudam  
Çûne ji dest eql û we fam  
Mecnûnî ez sehrameqam  
Dil kefte zarê efiyan

Ef'a li ser wa silsilîn  
Reşmar ji durcan kemilîn  
D'ber da binêr baxê gulîn  
Daîm xiyala hebsiyan

Mehbûs im ez zindanqefes  
Şaha ji min girtin hewes  
Zaxa ji dêm rengê weres  
Mexlûq miskê cismiyan

Mexlûq ji misk rengê cesed  
Dendan û lêv le'l û bered  
Bê wa niye ew reng çu qed  
Di mexrîb û di şerqiyan

Nîne di şerq ew rengzerî  
Îsanek e mislê perî  
Mewla ji nûrê afirî  
Natêt ji wê din wesfiyan

EHMED mebe cewr û cefa  
Tu terk meke emrê Îla(h)  
Lew aqîbet wê bin fena  
Bigre terîqa şer'iyân

## BEND: 2

Îro ji cernalata te dilê min bi birîn e

Ellah çî hebîb î, çî tebîb î, vêkewîne

Mislê te ne Adem û ne Îbrahîm û ne Nûh  
Yûsuf bi te mehbûb û li Yaqûbî şêrîn e

Xeyrî te nehin der sedefê behrê wicûdê  
Lew lazime em qesdê bikin rahê Medîne

Gava ku tu hafî bûye ruhnayî li her ca  
Êdî me nedî zulm û xerabî veşirîn e

Ger dê tu nebuya nedibû çerxê bedayîr  
Sergeşte ji şewqê te, tenê ne melekî ne

Carek tu nezer ke minê miskîn ê xerîb e  
Berde me ji hebsê, û ji zîndanê derîne

Mî'racê digel kes nebûyî sedrê rîsalet  
Qasid ji Xwedê bo te ye Cibrîlê emîn e

Bo-Bekr û Umer herdu ji huba te dinalin  
Meqtûl ji fîraqa te çî Osman û Elî ne

Îsmê te ye mektûbe digel îsmê Xwedayî  
Çend muznib û 'asî bi wî navî xefirî ne

Fehmê min e qasir û neşim wesfê eda kim  
Meddah ji tu ra Xalîqo hindî melekî ne

Daîm ji xiyala te me sed nale di dil da  
Lewra ji mîsala te çu sorgul me nedîne

Zalim veşêrî kufre nema qet di dinê da  
Cennet bi wê remzê xemilîn hor û perî ne

Şems û qemerê şûle ji ruyê te vedabû  
Ya mûm ji te bû mûm û şemalê ji ayîn e

'Eksê ji ruhnê te şeb û rojan we dixwazin  
Hindî ku hene xemleyê mîr'at û ayîne

Carek tu şefa'et ke bi navê xwe ji bo min  
Lewra ku MELÊ xeyrî te îmdadî çunîne

(Ji pirtûka *Nimûne ji gencîneya çanda qe-dexekirî*) □

# PÊKENIYEK JI XOCÊ MEŞHÛR

Dibêjin rojek ji rojan sê keşîş hatin gundê Xocê Meşhûr (Nesredîn). Ev keşîşana gazî dikin gundiyan û dibêjin: “Hinek pirsîyarên me hene, heger

mû nexwendî bûn, nezan bûn. Lê nêta keşîşan jî gellek xirab bû. Lewra armanca wan, dixwestin ku bawerîya mislimana biçewtînin û wan ji ser rêka Xwedê bixînin. Loma gund gund, warê mislimanan digeriyan (mîna ku îro jî mîsyonerên wan, li nav cîhana Îslamê de vî karê

bo bersîvdayîna we, em ê gazî wî bikin.”

Demekê şûn de, gundî û Xoce Nesredîn bi hev re hatin. Di pê silavdayînê re hinek xweş-bêş kirin. Xoce vegeriya ser keşîşan û got:

“Gellî keşîşan, ez amade me, de kanê pirsîyarên xwe bikin.”

Ji keşîşan yê riha wî û temenê wî dirêjtir, got: “Ya Xoce, ez ê pirsîyarek wisa zor ji te bipirsim ku wê pergela te şaş be.”

Xoce go: “Fermo!”

— “Bêje ey Xoce, navenda dinyayê kû dever e?”

Xoce bê hêzirî û bê rawest:

— “Keşîşê qeşmer, ma ji vêya hêsantir çiyê? Binehêr e navenda dinyayê, ji her dû lingên pêşiyên kera min, yê rastê ye ku li ser nuqta navendê ye.

Keşîş li pêş vê bersîvê lêvên xwe gezkir. Bi metel, “Ma Xoce tu ji ku ve pê dizanî ku ev cihê bin lingê kerê, navenda dinyayê ye?”

Xoce got: “Belê, ez dizanim; hem jî bê guman. Ger tu guman dikî, bipîve. Heger wek min derneket ez ê werim ser dîne te.” Ev mantiqa Xocêyê kone, keşîş şaş û heyirand. Heman îman anî û bû misliman.



hûn wan bersîvdar bikin, em ê têkevin dîne we (Îslamê). Na, heger hûn nikaribin bersîva van pirsîyarên me bidin, divê ku hûn ji dîne xwe biqetin û têkevin dîne me (Xiristîyanîyê).

Gundiyan li vana metel dimînin (diheyirin). Gelo evana ewê çî ji me bipirsîn, wê pirsîyarên wan çî bin? Dîtirsîn, bi van reşreşokên nêtxirab bawerî û spariyê naynîn. Di nav xwe de dişewirin, çî divêt bê kirin. Gundî bi xwe ne bawer bûn. Lewra he-

xwe yê xirab didomînin).

Gundî di nav vê telaş û gelagopê de bêçar ma bûn. Keşîşan, di binê simbêl û rihên xwe yêنجنجî de bi mislimanan dikenîyan û henekên xwe bi Îslamê dikirin.

Di vê hengamê de gundîkê got: “Ma Xocêyê Meşhûr miriye, em ê bang li wî bikin, bila ew were bersîva vana bide.” Heman ji gundiyan yek rabû û destûr ji keşîşan xwest û got: “Zanayekî me heye, ji



Îcar keşîşê rih navçe û navsalî dest bi pirsiyara xwe kir: “Dibêje xoce, li ezmana çend heb stêrk henin?” Xocê Meşhûr, hinekî nava riha xwe xurand, çavê wî dîsa rohnî bû. Li hember vê pirsiyarê ji wilo bersîv da:

— “Keşîşê gewende, ev pirsiyara te, ji ya pêşiyê rehetir e. Binihêr li kera min, çiqas mû li piştê wê hebin li azmana jî ewqas stêrk henin.”

Keşîş, guwînzêr bû û permilî. Got: “Na, ez qebûl nakim, tu ji ku ve zanî ku hejmara stêrkên azman, bi qasî tayê mûyên kerê te ne?” Xoce qehirî:

— “Bêbextê xwenzan! Te pirs kir, min jî bersîv da. Ez wirganî dizanim. Na heger tu şibhê dikî, ti kesî rêk li ber te negirtiye. Fermo, derkeve azmanan, stêrkan bijimêre. Heger wek min derneket, bi sond ez ê dev ji dînê xwe berdîm û bême ser dînê te.”

Keşîş nêhîrt, derkeftina azmana tişteki ne mumkin (derfêt)e. Wê çawa bike? Çare nedît, ew jî tiliya şehadetê rakir û bû misliman.

Ma, nema. Keşîşê sêhem ma. Wî jî bi gor hişê xwe pirsiyarek dagirtibû, ji kêf û kenan

tibîsk dihavêt. Dihêzî-  
a, “ez ê bi vê pirsiyara çetîn, hem hevalên xwe bixelisînim, hem jî vî Xoceyî ji ser dînê wî bizivîrînim.” Bi vê hêvî û teseliyê dest bi pirsiyara xwe kir û got:

— “Ey Xoce, bibêje min, çend tayê riha min hene?” Xoce wê demê got: “ez çi bikim, çi nekim? Ji min re muçingek divêt hebe.” Gazî kir gundiyeke got: “Biçe ji malê muçinga min bîne.” Keşîş got “Xoce, ma tu muçingê çilo dikî?” Xoce got:

— Xwedê dizanî, qasê pîjîkê qemçîka kera min wê tayê riha te hebe.

Keşîş har û dîn bû; li xwe xist, hawar pê ket; ilhas wê ev bersîva Xoce neyê pejirandin. Lewra ti kesî tayê riha wî ne jimartibû. Lê Xoce got: “Rehet bisekine keşîşê tolaz, ji xwe min lewma muçing xwestibû. Va ye muçing, ev boça kerê, aha ev jî riha te ya wek tefşo... Niha li ber çavê vê civatê ez ê tayekî ji riha te û pîjîkê ji boça kera xwe bikşînim. Heger wek min gotibû, wek hev dernekeve, bila ev civat şahid be, ez ê werim ser dînê te. Na, heger mîna min be, wê çaxê tû dev ji vê rikê (înad) berde û we re ser rêka heq û ras-

tiyê.

Keşîş riha xwe le-  
pand û hinekî jî xurand. Çare nedît, bû misliman. Lewra dibit ku wek Xoce nebana, digel tehemulkirina tabita rih kişandin tişteke gellek cansot bû. Ji ber viya ew jî hîlbijartina dînê Îslamê yekane çare ji xwe re dît. Dawiyê re, her sê keşîş bi yek devkî spasî ji Xoce kirin, gotin:



— “Xoceyê me, Xwedê ji te razî be ku, tu bûye sedemê îmananîna me; em gellek gellek ji te re spas dikin. Vê rindiya te, em ti carî jibîr nakin. Xoce jî, gotina xwe bi kurtebêjek henekdar qedand.

— “Na, na, ji min re ne... divêt hûn ji kera min re spas bikin. Lewra hemû bersîvên we, min li ser kera xwe dan. Ger ew nebana, min ê gellek zehmet bikişanda. □

# PÊŞVEÇÛN, BI XWENDIN Û DESTHEVGIRTIN Û XWE BI ÎSLAMÊ VE GIRÊDANÊ YE

•  
*Han di vir de xwendin ji me re pir pêwist e. Lazime ku em pir bixwînin. Lewra xwendin ayeta Qur'anê ya pêşî ye. Xweda Teala pêşiya her tiştî, emrê xwendinê dike. Xwendin ji azadiyê pareke pir mezin e. Pêşveçûna mirovan bi xwendinê ye.*

•

Ez derheqê pirs-girêka azadiya kurdan de vêya dibêjim:

Kurd, wexta ku xwe bi îslamê ve girêdin û bixwînin û dest bidin hevûdu, wê bikaribin azadiya xwe bistînin. Weki din ti raman yan jî meriv nikare wan xilas bike. Wexta ku xwe bi îslamê ve girêdin û ji bo îslamê xebat bikin, bila zanibin ku ji bo azadiya xwe xebat kirine. Lewra îslamiyet serrastî û azadiya mirovan e. Îslamiyet li kuderê bibe hakim, gelê wê derê ew ê bi azadî bijin. Lewra îslamiyet zilmê qebûl nake û li hemberê zilmê ye. Di îslamê de yek li yê din nikare zilmê bike û nikare mafê wî xesh bike. Lewra di îslamê de quwet di qanûnê de ye, ni di destê xurt de ye.

Di vêya de jî xuya dibe ku daxwazên me kurdan, hemû di îslamê

de ne. Madem tiştê ku em dixwazin, tev de di îslamiyetê de ne, pêwîste ku em îslamê bixwazin û ji bo wê bixebitin. Ji bona hukumdari-



ya wê lazime em cîhadê bikin. Û dîsa lazime em hemû îdeolojî û rejîmên beşerî red bikin û li pey wan em neçin. Lewra yê ku wan rejîmana anî-ne holê ew jî mîna me mirov in, ne Xweda ne. Ji ber ku ne Xweda ne, nikarin ji heqê hemû pirs-girêkên mirovan bêne der. Lê Xweda Teala em di şiklê tewr qe-

şeng hezîrandî ye.

Pêwîste em dev ji qanûnên ku merivan derxistine berdin. Lewra qanûnê ku xwestine têxin jiyana mirov, beşerî ne. Haşa ew ne Xweda ne.

Han di vir de xwendin ji me re pir pêwist e. Lazime ku em pir bixwînin. Lewra xwendin ayeta Qur'anê ya pêşî ye. Xweda Teala pêşiya her tiştî, emrê xwendinê dike. Xwendin ji azadiyê pareke pir mezin e. Pêşveçûna mirovan bi xwendinê ye.

Xwendin, lê çi xwendin? Xwendina ku ez dibêjim, xwendina Qur'anê, xwendina pirtûkên îslamî û xwendina weşanên bi zimanê me ye.

Ji tiştên ku em dixwazin yek jî, yekbûn û desthevgirtin e. Li hember zaliman pevra ser-rakirin e. Pêwîste em destê xwe bidin hev û bibin yek. Wexta em bibin yek, wê zalim bi me nikaribe. Em ê bi serê xwe li hûyerên gerdûnî mêze kin. Lê wexta em nebin yek, ew ê zalim bi rehet me bixwin û em ê li paş himînin. Vê bêjeya seydayê me Seîd ê Kurdî jibîr nekin: "Xwendin, xwendin, xwendin! Desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin!" □

# ÎSLAM Û MESELA QEWMİYETÊ

•  
**Meqseda pan-turkîstan, yekîtiya hemû gelê Tirk û inkariya gelê din bû. Ev polîtîka ha bi destê Partiya Ittîhad Teraqî hate tetbîq-kirin. Bi hezaran Kurd, Ermenî û Ereb kuştin û surgun kirin.**

Di sedsala 19 de Cemaleddîn Efxanî û hinek alimê din ji bo wahdet û tifaqa mislimanan xebateke muhîm kirin.

Dewletên emperyalîst wahdet û tifaqa mislimanan ji bo nehfê xwe yê siyasî û iqtisadî xeder dîtin.

Ji ber vê yekê ji bo ku yekîtiya ometa islamê belav bikin û hemû herêma islamê xweş talan bikin, hereketên qewmîyetê xistin nava mislimanan.

Di Imperatoriya Osmanî de derketina asebiyeta Tirkayetiye jî rast î sedsala XIX tê.

Musteşriqê bi nav û deng Bernard Lewis koka Tirkayetiye bi şeh yahudiyê Ewropayî ve girêdide.

Xebatkarê li ser Tirkayetiye yê ewil, Yahûdî Arthur Lumby David e. David yahûdîkî ji Ingiltereyê ye. David diçe Tirkîyê û li wê derê kitêbeke bi navê *Lêgerîna Kevnar* dinivîsîne û di vê kitêba xwe de li ser mezintiya Tirka di-sekine.

Pey xebata musteş-

riq, mîsyoner û siyonîstan, ronakbîrên Tirk Fuad û Cevdet Paşa nivîsên David dizivîrinin Tirkî. Pey zivîrandina van nivîsan ev ronakbîranan di bin darbenda "Jon Tirkan" de qala doza pan-turkîzmê kirin.

Meqseda pan-turkîstan, yekîtiya hemû gelê



Tirk û inkariya gelê din bû. Ev polîtîka ha bi destê Partiya Ittîhad Teraqî hate tetbîq-kirin. Bi hezaran Kurd, Ermenî û Ereb kuştin û surgun kirin.

Berdewama Partiya Ittîhad Teraqî, T.C. jî bi asebiyet û nijadperistîyeke mezin inkariya gelê Kurd kir. Bi hezaran Kurd hatin kuştin, yan jî surgun bûn.

Weke ku me li jor jî nivîsand, toximê asebiyetê bi destê yahûdiyên

Ewropayî li nava ometa islamê hate belavkirin.

Di islamê de asebiyetê heram e. Him di Qur'ana Kerîm de him jî di hedîsên sehîh de asebiyet hatiye menkirin. Ji ber vê yekê di dîroka islamê de bûyerên nijadperistî nayên dîtin.

Xwedê Teala di Qur'ana Kerîm de sedema xuliqandina gel û qebîleyan wiha nîşan dide:

*"Ey insanno! Bê şik û guman Me we ji jin û mîrekî xuliqand. Ji bo ku hun hevûdu nas bikin Me we kir (veqetand) gel û qebîleyan. Bêguman, li cem Xwedê qencîrê we, teqwatîrê we ye."* (Hucûrat: 13)

Resûlê Ekrem jî di hedîseke şerîf de wiha ferman dîke.

*"Yê ku di bin ala asebiyetê de şer bike û ji bo asebiyetê were xezebê û gazî asebiyetê bike û ji bo asebiyetê nefret bike û di vê reyê de bimre, bi mirîna cahîliyê dimire."*

Weke ku di vê ayetê de jî têtê xuya kirin, eslê hemû insanan yek e. Di koka insanîyetê de mîr û jinek (Adem û Hewa) heye. Ji ber vê yekê, ji bo ku koka insanan yek ti qewm ji qewmê din ne bi qimettir û rûmettir e. Rûmetî û mezintî bi teqwayê ye. Zî-

•  
*“Xuliqandina  
 erd û ezmanan  
 û cudabûna  
 reng  
 û zimanê  
 we, ji ayetên  
 Wî ne.  
 Bêguman  
 ji bona aliman  
 di vêya  
 de ayetin  
 hene.”*  
 (Rûm: 22)

ra hemû gelan zarokên dê û bavêkî ne.

Dîsa Xwedê Teala di Sûreta Rûm de wuha ferman dike:

*“Xuliqandina erd û ezmanan û cudabûna reng û zimanê we, ji ayetên Wî ne. Bêguman ji bona aliman di vêya de ayetin hene.”* (Rûm: 22)

Çawa ku xuliqandina erd û ezmanan ji ayetên Xwedê ne, cudabûna reng û zimanan jî ji ayetên Xwedê ne.

Ji ber vê yekê dema ku qewmek ji bo zimanê xwe û rengê xwe zilmê bibîne, lazime em li wan insanan xwedî derkevin. Çunku ew kesê zilmkar inkara ayetên Xwedê kirine û ji ayetên Xwedê re şer vekirine.

Îro Kurd ji bo Kurdîtiya wan, zimanê wan, navnasiya wan, dîroka wan û kultura wan hatiye inkarkirin. Lazime hemû misilman li hemberê vê zilmê bisekinin. Çunku rejîma T.C ji ayetên Xwedê re herb vekiriyê û ayetên Xwedê inkar kiriyê.

Bi kurtî, zalim kî dibe bila bibe lazime em li hemberê wî bisekinin û mazlum jî kî dibe bila bibe lazime em li wî xwedî derkevin. □

## PÊŞBAZÎ

Bi munasebeta salvegera yekemîn a kovara me Nûbihar, me pêşbaziyeke, yanê musabeqeke tertîb kiriyê.

Mijara vê pêşbaziye, *“Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû aliyên jiyane de, çi tasîrê li ser kurdan dike?”* ye.

Gereke nivîsar bi zimanê kurdî bêtin nivisandin û ne zêdetirî sê (3) rûpelên daktîlo bin.

Lazime nivîsar heta taliya meha tebax (agustos) ê bigihîjin destê me.

Nivîsarên 1. û 2. û 3. di hejmara 13'an de wê werin îlankirin.

Em ê xelatên pêşbaziye jî di wê tarîxe de pêşkêşî nivîskaran bikin.

**nûbihar**

## NUQURÇ / 3

*Dengê daholê bi te, ji dûr ve xweş têt mêro  
 Tu ku kerê cahil î, zirîn b'te xweş têt mêro  
 Cehenem ya herkesî, cenet ya te xwiya ye  
 Ceneta ku tu tède, li min ne xweş têt mêro*

23 Gulan 1993

Mela Qasim

## PÎROZBAHÎ

Kovara Nûbihar, di hejmara xwe yî heştan de, ji bo hîn-bûn û bikaranîna zimanê Kurdî, dest bi têkoşîneke mezin û şoreşeke bi rûmet kirîye. Bi vê cehd û têkoşîna wê, em we (berpirsiyar, birêvebir, karmend û karikerên Nûbihar) bi dilekî şad, pîroz û spas dikin.

Ev barê ku we hil-

daye ser milên xwe, dozeke herî pîroz û bi rûmet e. Em li hêviya we ne ku, hûn girseyên gel, bi hismendiyê (şîûreke) neteweyî hişyar bikin. Çavkaniyên xwe bixebitînin û derfetên xwe di babetên wiha bingehîn de binirxînin. We em bextewar kirin. Yezdan we bisitirîne.

Î. Omerî

## MU'ÎN Ê QEHHAR ARÎKARÊ WE BE

Gelî birayê me yên ku Nûbihar diweşînin;

Berî her tiştî, selam û rehmeta Xweda li ser we û hemû mislimanan û hemû hemiyetperweran be. Mu'înê Qehhar arîkarê we be. Bi derhatina Nûbihar em gelek dilxweş û şad bûn. Xweda vê dilxweşî û şadiya me berdewam bike.

Birayên ezîz;

Em dixwazin ku bêjeyên ferhengokê, bêjeyên wê hejmarê bi xwe bin. Mîna hejmara çaremîn nekin. Heger hûn mîna hejmarên pêşîn, ferhen-

gokê ji bo gotinên wê hejmarê çêkin, wê kovar hê bêhtir were famkirin.

Kurd ji zimanê Kurdî hinek bidûr ketine. Lê însaallah wê cardin bi zûyî hîn bibin.

Ko hun ferhengokê bi şiklê ku min got hazir bikin, heger em çend gotinan fam nekin, em ê li ferhengokê mêzekin û manawan gotinan hîn bibin.

Ji nûha ve pîrr spas dikim.

Bimînin di xweşiyê de.

Adem Murteza

## NALÎN

Esselamu aleykum, birayên têkoşer,

Pêwist e îro em Nûbihar li piya bigrin. Lewra di vê hengama keşmekeş de xwe giheştandiyê xwezî û meqsedan. Birîna dilbirînan kewandî ye. Kiriye wezîfe ji xwe re, pêşvebirina çand û huner û wêje û zimanê kurdî. Ez umrek dirêj û jiyaneke bêkêmasî ji bo Nûbihar dixwazim.

Her bijî kovara Nûbihar!..

NALÎN

*Hate xiyalê min pîrr şevêkê pîrr hezîn / Bi nalîn Kurdistan, qisekir bi kurtîn*

*Umrê min dibore mîna berfên par / Hun bê xebat û bê tebat û tim xewar*

*Ca hun rabin carrek j'vê xewa şêrîn / Cerg û hinav kiriye îro li min birîn*

*Ko hun dîsa nebin xwedî îro li min / Wê min bifroşin bi menfi wey halê min*

*Xizmetkar bim dîsa ez îro ji bo dîn / Hun bibin têkoşer he-ta dinya dîn*

*Min meydanê îro li xwe diye xalî / Hun hişyar kin îro gel ji*

xewa tarî

*Giriyê min tê bi halê min pîrr şewat / Li halê min nîne ji dil kes bi xebat*

*Bend bikin îro hûn çar terefê kurdan / Kurdistan xelaskin îro j' destê guran*

Evîndar

## LEZ BIKE

Xortê delal! Li min guhdarî bike. Li dorhêla xwe qenc mêzeke. Ka ev rewşa han çiyê? Bipirse ji xwe: Çend sal in razana te? Heta kengî ev razan, wê dom bike li serê te? Karwanê te hêdî hêdî, diçe bal meqseda xwe. Ne ji vê gavê nêzîktir, lez bike û lez bike. Xwişk û birayên te hemû, çavên wan li riya te. Kar û bar ê welêt, hemû mane li benda te. Heta tu vegeriyayî ji xurbetê, qeliyan gund û bajarê te. De bicivîn çekdarê xwe, şer bike û şer bike. Yan bixwîne yan şer bike, da tu serbilind bibe. Weke herdû Seîd'a, çêke serhildana xwe.

M. Diyaedîn  
Dağhan

# JI BO ZALIMAN BIJÎ CEHENEM

Esselamû eleykum  
Gelek selamê şoreşvanî li ser we bin.  
Bi derhatina kovara Nûbihar, em pîr  
kêfxweş bûn. Înşaallah hun ê vî karî  
berdewam bikin.  
Xweda yê arîkarîxwaz, arîkariya hemû  
gelê mazlûm bike.

## JI BO ZALIMAN BIJÎ CEHENEM

*Fikrêm cîhanek aşit û azad  
Ev doza pîr kevn ji dîrok de hat  
Mafên mazlûm û heqdar her bijî  
Ji bo vê dozê tev bikin xebat*

*Brayê hev in Tîrk û Kurd û Laz  
Ji bo serxwebûn şer dîkin Abxaz  
Boşnaq û Efxan, Azerî û Kurd  
Hemberê neyar bibin serfiraz*

*Xwînmij û dijmin, xayin Rojava  
Berdewam dike, zûde ev dawa  
Îbrahîm, Nemrûd, Mûsa û Fir'ewn  
Habil û Qabil, Dehak û Kawa*

*Zilma xwe danî îro li ser me  
Pîr kes qir kirin li ber çavê me  
Mamoste Seîd ê Kurdî dibêje  
"Ji bo zaliman bijî cehenem!"*

**M. Seîd Demirhan**

# AXAYÊ GUHMEZIN

Esselamu eleykum, ji we hemû kesên  
Nûbihara ku riya dînê me û mafê gelê  
bindest dibêje û diweşîne.  
Silavê Xwedê li ser hemû xebatkar û

xwendevanên we be.  
Xwedê tim rêya we ro-  
nî bike.

Gelî hevalên hêja û del-  
lal, ez xwendevanekî  
we me. Çiqas hejmarê  
Nûbihar hene, min te-  
mama wan taqîb kiriye.  
Pîr xweşiya min diçe,  
merev xwe pê nas dike.  
Ew tiştê ku di rêya dîn  
de ye û li alî mazlûman  
e ti tiştê jê bi rûmettir nî-  
ne.

Ez dixwazim ku kovara  
Nûbihar, vê helbesta ku  
min li ser axatîyê nivî-  
siye, biweşîne.

## AXAYÊ GUHMEZIN

*Ew axakî guhmezîna bû  
Herdu guhan bel kiribû  
Ew xwediyê zilm û zor  
bû  
Zilma axê li me pîr bû*

*Ew axak dijminê gel bû  
Karê wî ye, talanker bû  
Çavê wî li nanê me bû  
Zilma axê li me pîr bû*

*Axa xwe da bi lêcanê  
Çav berda gundê me-  
lanê  
Axa kumîşt ser diwanê  
Zilma axê li me pîr bû*

*Mizgeft tewla hespê wî  
bû*

*Mîhrab axurê hespê wî  
bû*

*Dîn û îman qet jê'r ne-  
bû*

*Zilma axê li me pîr bû*

**Asım Yüksel**

# ÇAVÊ ME LI RÊ QERIMÎN

Selat û selama  
Xwedê li ser we kar-  
mendê Nûbihar û ne-  
tewê we yê mazlûm be.

Bi navê Yezdan ê  
Dilovîn ê Dilovan,

Ey birayên delal; bi  
çapkirina pirtûka Pe-  
yivên Piçûk û Peyiva  
Bîst û Sêyemîn, em pîr  
dîlxweş û kefxweş bi-  
bûn. Feqet em hezîdîkin  
ku hun ji Risale-î Nûr

pîr pirtûkan wergerî-  
nin zimanê Kurdî. Çavê  
me li rê qerimîn. Bi îz-  
na Xwedê hun ê vê dax-  
waziya me bînin cih.

Ricake min dîsa ji  
we heye; we di kovara  
Nûbihar de (hejmara 6  
a) ji zarokan re çîrok ni-  
vîsandiye. Ev tiştêkî  
baş e, feqet ev çîrok 6  
rûpel girtiye. Ku mum-  
kin be hinekî kurt bini-  
vîsin û li şûnê hinek  
meselên girîng biweşî-  
nin; bi çavê min ewê  
baştir be.

Rica min a mezin ji  
we karmendên Nûbi-  
harê, kêmasiya kovarê  
çiqas kême be, ewqas  
rind e. Lazim e ku em  
kêmasiyan tim kême bi-  
kin û pêş ve biçin. Ni-  
vîsên ku ji we re tên,  
hun wan tetqîq bikin.

Ko çewtî di wan de hebin (di gotinan de yan jî di fikran de) lazim e ku hun rast bikin, yan jî neweşînin.

Xwedê we û gelê we yê mazlûm pêş ve bixe û serfiraz bike û we ji şerrê zaliman û xwînxwaran biparêze.

**Mistefa yê Memitî  
yê Rihawî**

## AZADÎ

Bismillahirrehmanirrehîm

Selamê Yezdan ê mezin li ser we xebatkarê kovara Nûbihar be.

Bi derketina kovara Nûbihar em bawermendê welatparêz, zehf dilxweş û şahnaz bûn. Ji bo xwe pê girtinê, hun ji me re bûne çiqilek. Yezdan ji we razî be.

Heta niha misliman li ser pirsgirêka Kurdan nedisekinîn û xwe jê dûr digirtin. Ev ji me mislimanan re şermeke zehf mezin bû. Înşaallah hun birayên hêja bi kovara Nûbihar hûn ê vê şermê ji holê rakin. Cihê ku misliman lêbe divê zilm li wir tinebe! Heger em li xwe nebin xwedî, kes li me nabe xwedî!

Hêviya min ji Yezdanê rehîm ev e ku vî gelê me yê mazlûm û hemû mazlûmê din, ji bin zilmê derxe, bi Îslamê azad bike.

AZADÎ

Azadî tu pîrr xweş î

*Ji me re cejna geş î  
Fevî tu dijmin î  
Li her çavê me reş î*

*Heta esîrî hebe  
Wê jîn ji me re nebe  
Dil bi azadî xweş e  
Jîn bi wêna dimeşe*

*Azadiya me kanî  
Ew naye bi hêsanî  
Gelan bi têkoşîna  
Azadiya xwe anî*

*Bo azadî xort hêz in  
Xwîna zalim dirêjin  
Azadî armanca me  
Em zilmê nabijrênin*

*Azadî mafê me ye  
Kurdistan warê me ye  
Gava mirov bindest bin  
Şerkirin karê me ye*

*Azadî dikim dawa  
Mafê hemû mirova  
Ew azadiya delal  
Ne tenê ji bo hova*

*Azadî bo me daxwaz  
Bûye evîn dike naz  
Zava li benda te ne  
Ev bindest û belengaz*

*Azadî ji bo Xweda  
Dermanê me bindesta  
Êdî bes e esîrî  
Em jî bibin ji aza*

*Azadî ji bo me doz  
Nêzîke wê bê pîroz  
Em ê bînîn azadî  
Ev ji me re bûye soz*

*Ko bigihêjin azadî  
Jiyan wê bikin şadî  
Mazlûm wê pê pîrr şa bî  
Tu her bijî azadî*

**M. Nafî Bêcirmanî**

## NÛBIHAR RONIYA ÇAVÊ ME YE

Ey xebatkarên Nûbihar  
Ji we re gelek spas dikim ku hûn gelek bi qîmet û bi rûmet in.

We eniya me spî kir û we dilê me xweş û fireh kir.

Nûbihar daxwaza dilê me ye  
Nûbihar sebeba heyata me ye  
Nûbihar mizgîna havîna me ye  
Nûbihar ji bo lewma dost û dijmin delîla me ye

Van gotinên xwe gelek ji dil dibêjim û sebeba gotinên min jî ev e:

Wextê ku me digot pirsgirêka kurdan îslam hel dike, dost û dijmin bi me bawer nedikirin.

Lêbelê rojek ji rojan me dît ku erd û azman bûye ronî û aso li me xuya kir. Em pê hesiyan ku kovara Nûbihar der hatiye. Wexta li me bû kêf û şahî, li dijmin bû fedî û lal û arî.

Nûbihar bû hîv û zîva me  
Nûbihar bû ava ser dilê me  
Nûbihar bû delîla dawa me  
Nûbihar bû rêberê xebata me

Ji bo vî, ji roja ewil heta niha, em ji bona weşandin û nasandin û xwendin û famkirina Nûbiharê xebatkar û xizmetkar in. Xwedê bê erê, em ê heta dawiyê jî dom bikin.

Him jî em hêvîdarê karên wekî dinin jî. Ji bo ku em mislimanin û, Nûbihar spîtiya eniya me ye  
Nûbihar rûmeta rûyê me ye  
Nûbihar ronîya çavê me ye

Em dizanin ku ji bona helkirina pirsakurdî, derhatina Nûbihar tenê ne bes e. Lêbelê ji bo helkirina vê pirsê, ev kovar ji bo mislimanan gava ewil e. Xizmetekî ewil e û pîrr mezîna e. Ji me re mizgîneke pîrr mezîna e ku pirsgirêka kurdan îslam hel bike.

Peyiva min a dawî, di vê xizmeta we de Xweda alîkarê we be.

**Mahmut Başeğmez**

# AX ME NEDÎT RIZGARIYÊ

Bismihî subhanehû  
Eselamu eleykum we rehme-  
tullahî we berekatuhû

Ey birayên min î ezîz û delal,  
ji ber van xebatên we yên hêja, we  
pîroz dikim. Pêşde çûyîn û do-  
mandina kovara Nûbiharê ji Yez-  
danê Dilovan niyaz dikim.

Nûbihar me ronî dike. Em pê  
serbilind in. Ez di vê baweriyê de  
me ku Nûbihar wê bibe dengê  
gelê me yê bindest.

Îro em jî karin bibêjin kovarek  
me jî heye.

Ey hevalên hêja, her wisa ser  
vê niyetê, ji bona "alîkariya bi  
qasî xwêya nav şorbê" ez dixwa-  
zim helbesta xwe ya li jêr ji we re  
bişînim. Heger munasib bibînin  
di Nûbiharê de biweşînin.

AX, ME NEDÎT RIZGARIYÊ  
Çendîn salin hêviya wê ne  
Bi sedsalan hezar salan  
Canê ciwan me pîrkirî

# NÛBIHAR ÎŞARETEKE BAŞ E

Gelî heval û hogirên hêja,  
Selam û rehmet û bereketa Xwe-  
da li ser hemû gelê li hember zilmê û  
zorê derdikevin be.

Heyanî roja îro zaliman her dem  
xwestine ku bi zordestiyê armanca  
xwe bînin cih. Em dizanin ku zor-  
destî karê zaliman e. Em dizanin ku  
bi zordestî armanca nayê cih. Kî xwe-  
dî li zordestiyê derketiye, pozê wî  
tim di erdê re çûye.

Em Misilman in û me îman aniyê  
ku axîret heye. Di axîretê de herkes  
li gora emelê xwe muamelê dibîne.  
Xwedê Teala ti carî zilmê nake û ji  
zilmê hez nake. Gereke misliman jî  
timî alîkariya heqiyê bikin û li hem-  
ber neheqiyê derkevin. Kî li hember  
neheqiyê dernekeve, ew şeytanê bê  
ziman e.

Cumhûriyeta Tirkîyê, em yên

*Ax, me nedît rizgariyê*

*Me rijandî hêsrê çavan  
Evqas hawar evqas fîxan  
Ax, me nedît rizgariyê*

*Zilm û zorî  
Heps û zîndan  
Lêdan û her lêdan  
Ax, me nedît rizgariyê*

*Birçîtî, tazîtî  
Mezinbûn bi sêwîtî  
Ax, me nedît rizgariyê*

*Ma ne be se ev çend sal in  
Hezarsal in li bindestan in  
Rizgarî mafê me ye  
Naxwazin bindestiyê  
Vê rewşê napejirînin  
Dixwazin azadiyê  
Lê mixabin...*

*Ax, me nedît rizgariyê*

**Elî Hikmet Tekin**

Kurd û Misliman, bi zilm û zorê ca-  
hil (nezan) hiştiye. Ji ruyê vê ne-  
zantiyê ye ku em li heqê xwe xwedî  
derneketin. Lêbelê vaye nayê gotin  
ku ji vê pê de jî em li heqê xwe xwe-  
dî dernakevin. Na. Em mislimanin,  
em mecbûrin ku li hember neheqiyê  
û zordestiyê derkevin.

Umêda min eve ku, ji îro û pê de  
em mislimanên Kurd, li hemû heqê  
ku Xweda daye me, xwedî derkevin.  
Kovara Nûbihar îşareteke baş e ji  
boyî umêda me. Xwedê me ji destê  
xapokan biparêze.

Heyanî roja îro min ti carî bi zi-  
manê Kurdî, name nenivisandibû. Ji  
bona vê dibe ku pîrr xetayên nivîsa  
min hebe. Inşaallah nameya min tê  
famkirin.

Wekîlê selama.

**Huseyin Birîndar**

# DERDÊ GIRAN

*Li çiya mij û dûman e  
Li deştê kafiristan e  
Kurdistanê xwîn dibare  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Kurdistan bu gola xwînê  
Dijminê me har û dîn e  
Azad çetîn dil birîn e  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Azadî xweş, dil nexweş e  
Dil bi birîn, ciger reş e  
Milet esîr kes nameşe  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Bariye jehr û baran e  
Kurdistan mij û dûman e  
Hewar hewara sêwiyan e  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Pîrek mirin lorik qir bû  
Bi hezaran insan mir bû  
Mirina pêşmerga jî pîr bû  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Qîr qîr daket li Kurdis-  
tanê  
Hewar daket li goristanê  
Pîrek zarok û lorik kanê  
Derd giran û pîrr yeman e*

*Kula mezin jibîr nabe  
Zalim ji xwînê têr nabe  
Şoreş bê xwîn û kul nabe  
Derd giran û pîrr yeman e*

**Fikri Bozkurt**



## FERHENGOK

- A**  
**Alîkar:** Yandaş, tarafdar  
**Amade:** Hazır  
**Amojkar:** Danışman  
**Armanç:** Amaç  
**Aso:** Ufuk  
**Asteng:** Engel  
**Axaftin:** Konuşma, hitap
- B**  
**Babet:** Konu, cins, kategori  
**Bawermend:** Inanan, inançlı  
**Bêav:** Susuz  
**Bêdînfî:** Dinsizlik  
**Berhevok:** Broşür, küçük kitap  
**Bername:** Program  
**Bernavk:** İlk ad, göbek adı  
**Bêserûberî:** Karmaşık  
**Betal:** İşsiz, avare  
**Bêtirs:** Korkusuz  
**Bexşandin:** Bahşetmek, bağışlamak  
**Birêvebir:** Yönetici, müdür  
**Bûyer:** Olay, hadise
- C**  
**Cazibedar:** Cezbedici  
**Cerg:** Ciğer  
**Civîn:** Toplantı  
**Cudabûn:** Ayrılmak, ayrılış
- Ç**  
**Çavkanî:** Kaynak, çeşme  
**Çekdar:** Silahlı
- D**  
**Damezirandin:** Kurmak, tesis etmek  
**Delal:** Sevgili, dost  
**Dergûş:** Beşik  
**Dêrandin:** Dağıtmak, eklemek, dikmek  
**Destnivîs:** El yazısı, yazma eser  
**Destûrname:** İcazet, diploma  
**Deşt:** Ova  
**Dibistan:** Okul  
**Dilovan:** Merhametli, şefkatli  
**Diyyar:** Somut, belli  
**Dîger:** Diğer
- Dîrok:** Tarih  
**Dîwan:** Şairlerin şiirlerini topladığı kitap  
**Doz:** Dawa, emel
- E**  
**Endam:** Üye  
**Ewle:** Güven  
**Ezperistî:** Bencilik
- Ê**  
**Êrîş:** Saldırı
- F**  
**Felişandin:** Dağıtmak
- G**  
**Gelemperî:** Umumiyet, genellik  
**Gerdûn:** Dünya  
**Girîng:** Önemli, mühim
- H**  
**Hengav:** An, dem  
**Herêm:** Bölge  
**Hêrgiz:** Asla, her zaman, daima  
**Hêsan:** Kolay, basit  
**Hewandin:** Barındırmak  
**Hewesat:** Hevesler  
**Hizirandin:** Düşünmek  
**Hinav:** İç organların tümü  
**Hov:** Vahşi, kaba, görgüsüz  
**Hozan:** Ozan
- K**  
**Karmend:** Memur, görevli  
**Kêmasî:** Eksiklik  
**Kirêt:** Pis, kirli  
**Kiryar:** Fiil, eylem  
**Komele:** Cemiyet, topluluk  
**Kone:** Kurnaz  
**Kumişandin:** Yıkılmak, abanmak
- L**  
**Layezel:** Zevalsız, bitmeyen, sürekli  
**Lêdan:** Dövmek  
**Lewm:** Ayıplama, serzeniş  
**Lewra:** Çünkü  
**Lîqahatin:** Karşılaşmak
- M**  
**Maf:** Hak, hukuk
- Mer'iyet:** Yürürlük  
**Mêras:** Miras  
**Metropol:** Büyük şehir  
**Mijar:** Konu, mevzu
- N**  
**Navçe:** Orta, merkez  
**Naverok:** İçindekiler  
**Navsalî:** Ortayaş  
**Naxwe:** Öyleyse, o halde  
**Nehf:** Fayda, istifade, çıkar  
**Nifir:** Beddua  
**Nirxandin:** Değerlendirmek  
**Nixumandin:** Örtmek, gizlemek  
**Nûdem:** Çağdaş, modern
- O**  
**Oldar:** Dindar
- P**  
**Parastin:** Korumak, muhafaza etmek  
**Parvebûn:** Parçalanmak  
**Payidar:** Sürekli, hisseli  
**Pejirandin:** Kabul etmek, tercih etmek  
**Pêşgotin:** Atasözü  
**Pêwîst:** Gerekli  
**Pîramîd:** Firavunların mezarları  
**Pîrozbahî:** Kutlama, tebrik etme  
**Pîroz:** Kutlu, mubarek, kutsal  
**Pirtûk:** Kitap
- Q**  
**Qender:** ... o dahi, ... varıncaya kadar  
**Qender delal:** Sevgili dahî  
**Qirn:** Yüzyıl  
**Qisekirin:** Anlatma, sohbet
- R**  
**Rawestin:** Durmak, dinlenmek  
**Raman:** Düşünce  
**Rêxistin:** Teşkilat, cemiyet, örgüt  
**Rêzan:** Mürşit, yol gösteren
- Rûgeş:** Şen  
**Rûmet:** Şeref
- S**  
**Sazgeh:** Kurum, kuruluş  
**Sedem:** Sebep  
**Sedsal:** Yüzyıl  
**Serbin:** Başaşağı  
**Serbixwe:** Bağımsız  
**Serfiraz:** Muzaffer, başarılı  
**Spas:** Teşekkür  
**Spehî:** Güzel, hoş  
**Stûr:** Kalın
- Ş**  
**Şanazî:** İftihar, gurur  
**Şermende:** Utangaç, mahcup  
**Şikeft:** Mağara  
**Şoreş:** İnkılap, devrim
- T**  
**Têkoşer:** Mücahit, mücadeleci  
**Têkoşîn:** Mücadele, savaşım  
**Tevger:** Hareket, hal, tutum  
**Tevkujî:** Katliam  
**Tîpên Latênî:** Latin harfleri  
**Tîfaq:** Birlik, ittifak  
**Tik tenê:** Yapayalnız  
**Tixûb:** Sınır, hudud
- V**  
**Vêk re:** Bütünöyle
- W**  
**Wargeh:** Kamp  
**Welatparêz:** Yurtsever  
**Welî:** Öyle, o şekilde
- X**  
**Xaçî:** Haçlı  
**Xalîbûn:** Tenhalaşmak  
**Xapînok:** Aldatıcı, aldatan şey  
**Xeter:** Tehlike  
**Xizanî:** Yoksulluk
- Y**  
**Yekrengî:** Monotonluk, tek renklilik
- Z**  
**Zarav:** Lehçe  
**Zordest:** Zalim

# RÊZEPİRS


**ÇEPERAST:** 1- Di mîtolojiya kurda de, navê qehremanekî 2- Li Wanê dewleteke û medeniyeteke kevn - Bergeh 3- Rewa, bi rê, munasib - Lewm, lom, gazin 4- (Berepaş) wiha, wer - Hesin 5- Eqil 6- Li Kurdistana bakur gazîkirina dayê - Îxtiyar, kokim, êxtiyar 7- Cihê ku diya peyxemberê me lê wefat kir - (Berepaş) kax, aşêf 8- Başqe, din, xêncî 9- Koçî, destpêka salnameya ku roja hîcretê dipejirîne - Hîç, nema, çû, tu 10- Alif, xol, êm, qût - (Berepaş) xidokbûn, sekihîn 11- Yawanî, kovî, kûvî, wehşî - Hêdî 12- (Berepaş) navê rojekî - Nifir, puşul

**SEREJÊR:** 1- Sala 1900 de hate dinyayê. 31 Adar 1947 de hate daliqandin. Serokê Komara Kurdistana Mehabadê Qadî ..... (resmê di navê de) - Basît, nebaş, arzan 2- (Berepaş) Şerpeze, betal, tolaz - Jin an mêrê ji hevdu qetiyanê - Cam a mîkroskopê 3- (Berepaş) deyn, qerd - Bûyer, bûnebûn - Şabaş, bexş 4- Vir, vira - Cûreyeke nivîsa xore 5- (Berepaş) di bijîjkî de nexweşiyek 6- Çipborî, borî - Navê bajarê Urfayê 7- (Berepaş) di zaravê soranî û zazakî de dew. - (Berepaş) zir, nîv 8- Belevok, rîsale, berhevok - Serîrakin, îsyankirin, îsyankarî 9- Hejmarekî - (Berepaş) Mûsîbet, serxwir, bêtar, xax - Di trafîqê de rumûza Tunîsê 10- Di muzîkê de notayekî - Hêja, mezintir, zêde - Zeybekên roavayê Anadolê.

## BERSÎVÊN HEJMARA NEHAN:

**ÇEPERAST:** 1-Mahabat-Du 2- Eleman-Kin 3-Leş-Ra-Adî 4-Asin-Pêlav 5-Re-Îne 6-Êb 7-Camî-Kes 8-Îp-Bî 9-Zad-Arafat 10-Îdew-Kabe 11-Ra-Genî 12-Înç-Qe-bîle

**SEREJÊR:** 1-Melayê Cizîrî 2-Ales-Ba-Adan 3-Heşir-Mîde 4-Am-Necîp-Wa 5-Bar 6-Anap-Ge 7-Akeb 8-Qalîsk-Fanî 9-Didan-Ebabîl 10-Unîversîte.



## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara Nûbihar.

*Nav û paşnav:*

*Navnîşan:*

*Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiye:*

*Li hundur:* Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

*Li derve:* Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiyê dagirin û tevî kopyeke pela razandina bedela abonetiye bişînin navnîşana me.

*Navnîşan:*

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul

Tel: 533 75 88 / Faks: 524 00 38

*Bedela abonetiye:*

*Li hundur:* 180.000 TL. *Li derve:* 60 DM.

# KITÊBÊN KU EM BELAV DIKIN

## (DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

### Kitêbên Kurdî (Kürdçe Kitaplar)

1- Ferheng (Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî) / D. İzoli .....	195.000.-
2- Ferheng (Zazakî-Tirkî) / Malmisanij .....	100.000.-
3- Mamoste Seîdê Norsî (Sorani, bi tîpên Erebi).....	40.000.-
4- Mewlûd / Mele Ehmedê Bateyî .....	20.000.-
5- Nalînên Min / M. Şakirê Koçer.....	10.000.-
6- Nûbar / Ehmedê Xanî.....	15.000.-
7- Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz).....	15.000.-
8- Peyivên Piçûk (Küçük Sözler).....	20.000.-
9- Rîsala Biratîyê (Uhuwvet Risalesi).....	15.000.-
10- Rîsala Biratîyê (Bi tîpên Erebi) .....	15.000.-

### Kitêbên Tirkî (Türkçe Kitaplar)

1- Aydınlik ve Dindarlik / A. Suruş.....	15.000.-
2- Ayet Yorumları / A. Şeriatî.....	25.000.-
3- Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması / A. Suruş.....	15.000.-
4- İlerici Gericilik / A. Suruş.....	10.000.-
5- İslam Ümmetinin Yetimleri Kürtler / F. Şinnavî.....	15.000.-
6- Kürt Soruşturması / Sor Yayınları.....	40.000.-
7- Peygamberler Aydınların Önderleri / A. Suruş.....	15.000.-
8- Şırnak Baskını / Osman Resulan.....	20.000.-
9- Zamanın Zeynebi / Z. Burucerdî.....	15.000.-

### Kitêbên Erebi (Arapça Kitaplar)

1- Lemalar (el-Leme'at).....	100.000.-
2- Mektubat (el-Mektûbat).....	100.000.-
3- Sözler (el-Kelimat).....	120.000.-

**Kitêbên li jor, bi silh ji sedî (30 %) erzanî têne şandin. Yên ku hun dixwezîn, navê wan binvîsin û ji me re rêbikin. Bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 30 % kêmbikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopiyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban tê de nivisandiye, bişînin navnîşana kovara me. Hengava ku mektûba we gihîşte destê me, wê kitêbên we ji we re bêne şandin.**

(Yukarıdaki kitaplar % 30 indirimle gönderilir. İstediklerinizin adını yazıp bize ulaştırın. Tutarlarını hesaplayın, toplamdan % 30 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve ücreti yatırdığınızı gösteren belgenin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiva eden mektupla birlikte dergimizin adresine gönderin. Mektubunuz elimize ulaşır ulaşmaz, kitaplarınız adresinize postalanacaktır.)

### JIMAREYÊN HESABÊ (HESAP NUMARALARI):

**Li hundir** (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve** (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100 - 3118770

### NAVNÎŞAN (ADRES):

Nûbihar Dergisi, Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul

Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

الله اعلم  
لا تغربوا ما بهنوا  
لا تغربوا ما بهنوا

ما بانفسه